


## Şerê Xelîcê Gîhaşt Qonaxa Dawiyê

◆◆ Piştî ku hêzên mutefik bi hêzên hawayî avayiyêñ eskerî û stratejik yên Iraqê tahrîb kirin di 24'ê Sibatê de şerê ser erdê dest pê kir. Di 100 seatê şerê ser erdê de nêzî 100 hezar leşkeren Iraqê teslim bûn. Iraqê ala teslîmbûnê kişand. Iraqê li Kuveytê rafineren petrolê dan ber agir



Dema hêzên mutefik êris birin ser Kuveytê bi hezaran leşkeren Iraqî ku bi rojan birçî û izole mabûn, bi kêtixwesi xwe teslimê wan kirin

Piştî ku Iraqê di 2'ê Tebaxa 1990'ı de Kuveyt îşxal, îlhak kir û piştî jî kir wilayeta xwe ya 19'an, di 17'ê Çileya Paşin de bi bîryara Netewêñ Yekbûyî(NY) hêzên mutefik (Amerika, Ingîltîre, İtalya, Fransa, Arebîstanâ Suûdî û yên din) bi balafiran êrisi Iraqê kirin. Daxwaza hêzên mutefik û Amerika ew bû ku leşkeren Iraqê bi zorê jî Kuveytê derxînin. NY bi pîranî bîryar girtibû ku ambargoya aborî deye

ser Iraqê û ku heta 15'ê Çileya Paşin Iraq leşkeren xwe ji Kuveytê venekşînê bi zorê wê ji Kuveytê bête derxistin.

Amerîka û hêzên mutefik bi quwetek hawayî ya xurt balafirgeh, fabrikên çekêñ kimyayî û bîyolojîk, rampayêñ fuzevîn scud, avayiyêñ staratejîk, pir, postexane, radyo û h.w.d ën Iraqê tahrîb kirin. Li gor aghadariyan, hêzên mutefik di mehekê de zêdeyî sê sed hezar bombe avêtin

ser Iraqê. Alîkarê Serokwezîr ye-kem yê Iraqê Sadûn Hamadî beyan da ku di şer de 20 hezar kes hatine kuştin û evqas jî hatine birîndar kirin.

Iraq ji bo ku qada şer fireh bike û şerê Xelîcê bike şerê Fileh û Misilmanan bi fuzevîn scud êrisi bir ser israîlê. Lî israîl nehat lîstika Iraqê û êrisi Iraqê nekir.

Dûmahîk: r. 11

## Kurd li Parîsê Civîyan

### "Pirs, Pirsa 30 milyon Kurd e"

Li ser vexwendina Enstituya Kurdi ya Parîsê, ji partiyan siyasi, komele, rîxistin û ronakbîrên Kurd bi qas 90 kesî roja 16-17'ê Sibatê li Parîsê civîyan. Bernama civîna Parîsê, şêwîr û mişêwîra li ser şerê Xelîcê û Kurdistanê bû.

Hêzên besarî civînê bûn hin jê ev bûn: Cepha Kurdistanâ Iraqê, Partî Demokratî Kurdistanî Iran, Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan (PPKK), KUK-SE, Partiya Hevgirtina Gelê Kurd li Sûriyê, KUK, T-KDP û h.w. din.

Roja duduyan xanîma serok-cumhûrê Fransayê François Mitterand; Danièle Mitterand ji li ser navê Weqfa Azadî ya Fransayê çû civînê û silav li besarîn civînê kir, fravîna nîvro bi hev re hat xwarin.

Di dawîya civînê de daxwîyaniyek ji bo raya gişî ya Kurd hat qebûlkirin.

## Daxuyaniya Civîna Parîsê

r. 11

**"Di şerê Xelîcê de divê siyaseta Kurdan ci be?"** Armancê pirs kir, siyasiyêñ Kurd bersiv dan r. 4-5


**Ebdulah Peşew: "Edeba Kurdi li mihaciriye sêwî ye"** r. 6

**Hesen Mizgin: "Întibayê min ên li ser seyaheta Sovyetê" (reportaj)** r. 7

**Diyarbekir di sernewe û tesîrê cengê Kuveytî (Hesenî Giran/ Diyarbekir)** r. 10

XEMGÎNÎYEK MEZIN  
ŞAÎRÊ MEZIN, WELATPERWERÊ DILSOZ

## HEJAR WEFAT KIR



Hejar Mukriyanî

Mamostayê giranbuha, welatperwerê dilsoz, şâirê mezin û yet ji hîmdarêñ Enstituya Kurdi ya Parîsê, Mam Hejar şeva 21'ê Siba tê li Îranê li bajare Kerec'e di 70 salîya xwe de ji ber nexweşîya dil wefat kir.

Berî çendekî her ji ber vê nexweşîya xwe ya dil hatibû Fransayê, piştî emelîyatê vegeryabû welêt.

Kebara mirina wî di nav tevayıya Kurdan de bû ciyê xemgînîyek mezin.

**Bi Kurtî Jiyana Wî**  
**Mam HEJAR (Ebdurrehman Şerefkendî)**

"Hezar swêndî Bexda wekû pûş e lam

Le ser zorkeran merg e hêzî selam

Ser û mal be qurban dekeyn giştman

Le rîy serbexobûnî to Kurdistan."

**Şîreta wî ya ji bo Şérko'yê kurê wî:**

Ba min be hejarî biçime bin gil  
Kurd rojê debin be gul le ser cil  
Her hênde tikam le to ye rolem  
Merwane ke em şir û şirolem  
Zortir le minîş kiz û hejar bî  
Bê yar û nizar û lêw be bar bî  
Derbes mebe, bo gelit bikoşe  
Jehrawî le ser binoşe xoş e  
Bawkî to çilon bû, şwêni bigre  
Hîzane mejî, be merdî bimre."

Mam Hejar di sala 1921'ı de li Kurdistanâ Iranê, li bajare Mehabad'e hatîye dinê. Ew ji malbatek feqîr le xwende bû. Ew hîn 17 salî bû dê û bavê wî çûn rehmetê.

Navê wî yê rasûn Ebdurrehman Şerefkendî ye, lê wî navê xwe kîribû Hejar û bi vî navî li Kurdistanê nav û dengê wî belav bûbû.

Hejar di salên 1940'ı de wek şairekî gel dihat naskirin. Lî bi taybetî piştî avabûna Komara

Kurdistana Mehabadê, ci bi kar û barêñ xwe yên siyasi û ci bi helbesten xwe, nav û dengê wî li herderê Kurdistanê belav bû. Ji xwe dîwana wî ya pêşîn "Alekok" jî her di wê wextê de hatîye çapkirin û belavkirin.

Mam Hejar di dewra Komara Mehabadê de li gel Hesen Qizilcî û Hêmin Mukriyanî û hin ro-nakbîrên din ji alî edebî û kulturi de xebateke gelek baş kirin. Her wê wextê yanî di 1946'an de li gel Hesen Qizilcî li bajare Bo-kanê kovara Helale derdixistin. Dîsa alîkarîya kovara Hawarî Niştiman, Niştiman, Gir û Gali Mindalan û kovar û rojnama Kurdistanê kir ku ji alî Komara Mehabadê dihatin derxistin.

Salên 1950-60'ı de ji li Kurdistanâ Iraqê di gelek kovar û rojnamayê wek Ronahî, Hîwa û hwd de gelek helbest û meqaleyen wî derketin.

Beyî meqale û helbesten wî yên ku di kovar û rojnaman de derkete bi qasî ku em pê dizanî nêzî 22 kitêbên wî derketine. Ji wan hinek ev in:

- Alekok (helbest)
- Hejar Bo Kurdistan (helbest)
- Xeyyam (helbesten) Xeyyam wergerandiye Kurdi

- Mem û Zîn a Ehmedê Xanî (cara pêşî wergerandiye Kurdiya Mukri-Soranî û çapkirîye, cara 2. jî eslî kitêbê li gel şerh û ferhen-gokekê).

- Dîwana Melayê Cizîrî (ligel şerh û ferhengokê).

- Tarîxî Erdelan (werger)
- Eşiretî Gewan (werger)
- Ferhengî Kurdi-Farisî

- Mam Hejar ci ji alî dînî(olî), ci ji alî din be, zanayekî mezin bû, jixwe mirov vê zanîna wî ya kûr di berhemê wî de dibîne.

- Hejar li gel Farisî, Erebî û piçek Ingilizî û Rûsî her weha bi

Dûmahîk: r. 11

## Ekrem Mayî xelata xwe ji destê Peter Gabriel wergirt

Roja 12'ê Çileya Pêşin a 1990'an li Bostanê xelatgirê Xelata Mafêni Mirovayî ya Reebak a 1990'an, gelek tevî hûnermendê bi navûdeng ji alî Fonda Recbak bi xêrhatinî hatin qebûlkin. Di nav wan de dengbêj/strannivîs û xebatke-rêna mafê mirovayî yên wek Peter Gabriel, Joan Baez, Lou Reed, Johnny Clegg, Bonnie Raitt û Jackson Browne jî hebûn.

Ji bo hevnaskirina xelatgir û mîvanen mayî fravînek li Park Plaza Hotel hat dayîn. Ekrem Mayî berpirsiyare kampa penaberên Kurd a Diyarbekirê jî layiqî xelatê hatibû dîtin û nav vexwendiyen de bû. Dengbêjê bi navûdeng Peter Gabriel bi kîfxwesi pêrgî li wî kir û guhdariya agahdariyên Ekrem Mayî kir; ku li ser bikar-anîna çekêni kîmyayî li hemberî Kurdan bûn. Ekrem Mayî ji Gabriel re got: "Gava em li nav gund dîmeşîyan min dît ku her tişt mirîye xelk, çelek, mirîsk heta cîvîkîn ji daran jî hatibûn xwarê."

Roja 13'ê mehî jî li salona Park Plaza Hotelê merasima xeletdayînê hat lidarxistin. Peyva vekirina merasimê ji alî Peter Gabriel hat kirin û wî cara pêşin Ekrem Mayî dawet kir ku were xelata xwe werbigre. Gabriel got ku: "Şerefek e ji bo min ku niha xelatwergirê navnetewi yên pêşin ê Xelata Mafê Mirovayî ya Reebokê pêşkêşî we bikim, meriveki ciwan(genc) ê ku têkoşîneke bi mîrxasî ji bo mafêni Kurdan dide. Ekrem Mayî yên ku xizmet dide wek ber-pirsiyarekî bi hezaran xelkê xwe yên ku li Tirkîyê di kampên penaberan de dijin. Di bin hoy-en xeter de tevî ku rîskîn mezin hene ji ew muhawele dike ku jiyan û siheta wan biparêza."

Du perdîn camîn(ekran) ên mezin her yek li aliyekeî hatibûn danîn ku di wan de jiyanâ penaberên ku hatibûn Kurdistana



Stranbêjê bi nav û deng yên Ingiliz Peter Gabriel di merasimê de got ku: "Şerefek e ji bo min ku niha xelatwergirê navnetewi yên pêşin Xelata Mafê Mirovayî ya Reebokê pêşkêşî. Ekrem Mayî bikim". (Foto:Armanc)

Tirkîyê hatin nîşandan û pê re ji hevpeyînek bi Ekrem Mayî re hat nîşandan ku demek berê li Kampa Diyarbekirê pê re hatibû kirin. Piştre Peter Gabriel xelat bi destê xwe da Ekrem Mayî. Ekrem Mayî ji sipasiyên xwe pêşkêş kirin û qasî deh deqan axaftinek kir ku li ser rewşa penaberên Kurd û tevgera giştî ya Kurd bû. Di dawiya peyva xwe de Mayî got ku pirsa Kurdi divê di civîn û konferansê navnetewi de ciyê xwe bigre. Çimkî heta pirsa Kurdi neyê çareserkirin aştiyek rastin nayê Rojhilata Navîn.

Kesêñ din ên ku xelat girtin ev bûn: Sha'wan Jabarin xe-

batkarekî Filistinî ku li ser rewşa penaberên Filistinî yên Şaria Rojava kar dike û Davîd Moya, siyasiyek Kubayî ku hê nuh ji hefsê atiye berdan, lê izna wî nehatibû dayîn ku bê xelata xwe werbigre.

Piştî merasima xelatparvekiri-nê, civînek pressê ji pêk hat ku gelek rojname, radyo û televîzyon tê de beşdarbûn. Ekrem Mayî di merasimê de serpûşek Kurdi hediyeji Peter Gabriel kir ku bi destan ji nexşen milî yên Kurd hatibû çeki-rin. Peter Gabriel heta dawiya merasimê û di civîna pressê de ji ew serpûş(kum) ji serê xwe dananî.

□

roka yekemîn "Peyam" derket. Ev çîrok ji aliye Perwiz Cihanî ku li bajarê Urmuyê (Kurdistanâ İranê) dimîne, hatiye nîşandin. Helbesta yekemîn "Rismen Salê ne" û ji aliye Omer Okumuş ku li Stockholmê dimîne hatiye nîşandin.

Di beşê Kurmanciya jorîn de çîroka yekemîn a Fazil Kerîm Ahmed ya bi navê "Nemkim Nayewê Kes Merekani Bidoşê" derket. Fazil Kerîm Ahmed li Almanyayê dimîne. Helbesta yekem ji "Gulî Ser Gor" e. Şairê vê Ferhat Pîrba e. Ferhat Pîrba li Fransayê dimîne.

Li gor bîrîyaren juriyê encama "Xelata Berbangê '90" ev in.

Di beşê Kurmanciya jorîn de çî-

## Çalakiyek hêja ji Federasyona Kurdan a li Swêdê

### "Xelata Berbangê"

Federasyona Komelên Kurdistana li Swêdê bi navê "Xelata Berbangê '90" musabegeyek çandî vekir. Musabeqe du beş bû; helbest û çîrok. Federasyonê ev musabeqe di sê zaravê Kurdi de vekir; Kurmanciya jorîn, Kurmanciya jérîn û Zazakî. Ji bo her zaravayî juriyek hat teşkîlkin. Jûri li ser esasî nîvîskarek çîro-kek, helbestvanek helbestek xebî-

tî. Di vî karê Federasyonê yên hêja de ji texmînan wêdetir raxbet peyda bû. Di beşê zaravê Kurmanciya jorîn de 37 helbest, 23 çîrok, di beşê zaravê Kurmanciya jérîn de 18 çîrok û 13 helbest, di beşê Zazakî de 5 helbest û 10 çîrok ketin hilbijartînê.

Li gor bîrîyaren juriyê encama "Xelata Berbangê '90" ev in.

Di beşê Kurmanciya jorîn de çî-

**Redaksiyon:** M. Eli, Zinare Xamo, Hesîn Mizgin, Lewend Fîrat, Mirza Beşîyar.  
**Kedaktore berpirsiyare:** M. Eli  
**Berpirsiyarekî beşê Dîmlîkî:** Malmisanî

**Adres:** Armanc  
P. Box 6344  
172 06 Sundbyberg  
Sweden

**Telex:**  
ATTN ARMANC 11683 TELE KL  
**Telefaz:**  
ATTN ARMANC 46-8-801825

**Ansvarliggivare:**  
Kurdisk Demokratiska  
Arbetsar Unionen  
Postadress: 60-37 99-9  
ISSN: 0346-7383

## Tiştê ku tixtoran nikarîbû fuza Scud kir

Herba Xelîcê bi çek û teknolojiya herî modern dom dike. Wek di her herbê de, rojname bes qala kuştî û birindaran na-kin, yekcarna hin nûçeyen ku ji xweber pêkenin in jî diweşînin. Emê li jér qala pêkenînekê bikin, ku li gor rojnameyê bi rastî qewimî ye.

Li gor ku hatiye nîşandin, berî ku Iraq bi fuze-yen Scud êrîşî Israîl bike bi hefteyekê, li Telawîw li nexweşxana Boîlin yekî Yahudî emeliyet dibe. Yê nexweş yekî 44 salî ye. Tixtor gurçikeke wî digrin. Emeliyat bi serfirazî derbas dibe. Lê ya xerab yê nexweş piştî emeliyatê bi xwe nahese. Loma jî ji herbê û ji êrîşen Iraqî ên bi fuze-yen Scud ji binde bê hay e. Li gel ku di ser emeliyatê re hefteyek jî dibuhure tixtor cardin jî nikarîn wî bînîn ser hişê wî.

Lê rojekê ji fuze-yen yek, li nêzî nexweşxanê dikeve. Ew tixtorênu ku ji serê rojan ve bû nikarîbûn mîrik şiyar bikirana, nuha rûbirûyî mucîzeyekê bûn: Saddam bi fuze-yek Scud ew gişt matmayî hîstibûn, mîrik bi dengê fuze-yen re hêdî hêdî xwe livandibû û hatibû ser hişê xwe. Lê mesele li vir naqede, bi şiyarbûnê re tiştê ku mîrik dibîne bavo ci bibîne: Hinek tebayen wek ên fezayê, di serê wan de maskeyen gazê û li ser serê wî kom bûne.

Dr. George Nakash dibêje, cer çavê wî li me ket, tavîlê xwe wenda kir. Ü piştî ku hat ser hişê xwe ji me pirsî, got, gelo em benderuhêne fezayê ne yan însan in û ew miriye ya sax e?

Piştî vê pirsa yê nexweş tixtor maskeya serê xwe hinekî bilind dike û hewl dide ku jê re meselî izah bike, bibêje ku Iraqî bi fuze-yen êrîş kiriye, loma maske di serê me da ne. Lê yê nexweş gava van gotinê tixtor dibihiye tew ji binde cunî dibe û bi dengekî bilind bi ser tixtor de diqîre dibêje, ji ba min biterqize û hêzî ser xwe dike û bi tîzika dihere tixtor, dibêje:

-Tu Ezraîl û, xwe nêzî min meke.

Piştî tahlüke derbas dibe, alarm disekine, mîrik dibîne ku yên li dora wî ne tebayen fezayê, lê însanen wek wî ne. Hînuh ruh pêde tê û dihêle tixtor û hemşire nêzî wî bibin.

## Li hember çekêni kîmyayî yên Saddam aletek baş ya xwe parastinê:

### Mirişk

Piştî ku fuze-yen Sovyeti yên Scud bi teknika Almanan hîn jî hat bi pêş de birin û bi saya vê teknikê Saddam ew şandin ser Israîl, li Telawîw û li Qudusê ew bi ser serê gel de barandin û hêzên muttefik û Israîl bi çekêni kîmyayî tehdît kir, ji hin fabriqeyan re bazarek nuh vebû. Ji mecbûrî her dewletê li hember vê tehdîda Sed-dam ji xwe re hin tedbîr girtin. Mesela, Israîl li hemû hemwelati-yen xwe maskeyen gazê belav kir. Suûdî her bi vî hawî... Koma miletan û Swêdiyan jî ji Filistinîyan re maskeyen gazê şandin.

Hûnê bibêjin çawa?  
Li gor tê gotin xwedêgiravî li hember gazê jahrê mirîşk heywanek pîrressas e, hema gava bîna gazê werê di cî de dibe term. Loma jî Kurdîn wê herêmê êvarê berî raketinê mirîşkî li der bi derî ve girê didin. Sibê, berî ku derkevin der bala xwe didinê, heger mirîşk sax be ev tê wê manê ku Saddam wê rojê çekêni kîmyayî bi kar neaniye. Na ku mirîşk mirî be, wê gavê tê fahmkirin ku erd û ezman tev jahr e, divê ji hundur dernekevin.

Îcar mirîşk jî ji serma ya jî bi emrê Xwedê mirî be wê çawa tê derxin, ew ne diyar e.  
Li hemû welatê pêşketî ji bo xwe parastina li hember çekêni kîmyayî gelek lêkolîn çedîbin û tedbîr tê girtin. Lê hîn tu kesi tedbîrek wiha "baş" û bi kîr hatî kişif nekiriye.

Piştî ku dewletê maskeyen gazê neda milet, xwedîyên fabriqeyan destêne xwe di hev dan û ta'ma

## Batman tevî herba Delavê bû

**Leşkerên biyanî li Batmanê bi cî bûn. 24 saet balafir li dû balafirê radibin û li bakurê Iraqê dixin. Çend bombe li dor Batmanê û Dihê ketin. Petrola xam ya ji Batmanê dertê bêyi ku were rafine kirin, neqlî bajarê rojava dikan.**

(Roza DİLAN / Batman)

Ji roja 20'ê Çileya Paşin vir de ye leşkerên Amerikî misêwa têni li Batmanê bi cî dibin. Heta nuha nêzî 1000 leşkerên Amerikî li Batmanê bi cî bûn. Lokal û gazi-noyen balefirgeha leşkerî ya Batmanê kirin nexweşxane û nêzî 250 elemanê tenduristî ku ji Anqerê hatibûn şandin, li wê dest bi wezifê kirin.

Ü alîkarî ji nexweşxana sivîl ya Batmanê xwestin. Lî çend doktorê ku nexwestin di vî karî de besdar bin ji Batmanê reviyan.

Balefirgeha Batmanê bi awakî aktifî di şerê Delavê de tê bi kar-anîn. Balafirê ji vir radibin li megerên leşkerî yê Iraqê ku li Kurdistanâ Iraqê ne, dixin. Bi şev û roj, balafir li dû balafirê bi roket û bombayan radibin û bê bombe dizvirin. Li gor Batmaniyan, roj heye 700 car balafir radi-bin û datinîn.

### Li Batmanê û Dihê bombe

Li gor şahidiya xelkên herêmê li dor Batman û Dihê çend bombe li ser hev ketine. Herçiqas me hewl da ku em di vî warî de ji berpirsyaran tiştekî hîn bibin jî me tu bersîv ji pirsên xwe re negirt.

### Li Batmanê kozik

Waliyê Batmanê talîmat da ku kesen Batmanê terk dikan divê huviyeta wan were tespitkirin. Li dor Batmanê kozik tê kolandin û leşker têni bi cîh kirin. Karkirê rafina Batmanê mecbûr dikan ku ji bo eskeran kozikan bikolin.

Ji aliyê din de jî, rafina Batmanê tê valakirin û neqlê Tirkîye dikin. Li gor beyanên berpirsyaran hinek ji petrola xam pompeyî Yumurtaligê dikin û hinekî jî bi trêne neqlî hin bajarê Tirkîye yê din dikan ku navê wan nayen diyar kirin.

## Li Bismil du bûyer

(Diyarbekir-Armanc)

Di roja 19.01.1991'ê de li seriya navbera Bismil û Çinarê cesedekî gundiyekî Kurd bi navê Zahar Turan hate dîtin. Zahar Turan ji gundê Şerefî ye ku ev gund jî girêdayî qeza Çinarê ye. Li gor lêkolînêne me birayê Zahar Turan neh meh berê bi iddiâ bombekirina bînaya MÎT'ê ya Diyarbekirê hatibû girtin û hîn jî di girtîgeha Bismilê da girtiye. Lî li gor muşahada pisporan, berî ku cesedê Zahar Turan bête dîtin bi hefteyekê, hatiye kuştin.

Li Bismilê rojê navbera 24 û

Diyarbekir:

## Pêşmerge di pencê nexweşiyêñ dirmî de

**Ji sala çûyî vir de ji 11 hezar 243 pêşmergan 275'ê wan ji nexwesiyêñ dirmî mirin.**

(Diyarbekir-Armanc)

Li gor agahdariyê Muduriyeta Tendurustî ya Diyarbekirê di salekê de 275 kes ji malbatên pêşmergan mirin. Ji sedî 70'ê wan zarok û pîrek in. Dîsa li gor agahdariyê ji pêşmergen kampa Diyarbekir,

7130 kesî tedawiya tuberkulozê, 1426 kesî ya teraxomê, 208 kesî jî tedawiya tayê dîtiye.

Wek tê zanîn di daireyeke ji bo 4 kesan de 34 kes dimînin û ji xwarinek normal jî mehrûm dijin.


## Li gelek gundan mirov û dewar ji eynî ciyi av vedixwin

(Diyarbekir-Armanc)

Li nêzika 5 hezar gundêni Diyarbekirê, Ruhayê, Mêrdinê, Şirnaxê, Sêrtê, Batmanê û Colemêrgê mirov, terş û dewar ji yek kaniyê û avê bi kar tînin.

Berpirsyarekî Muduriyeta Muesesa Xizmeta Gundan di beyana xwe de da diyarkirin ku li herêmê tunebûna avê gihiş-

tiye nuxteyek gelek xeter. Di vê meselê de daxwaza gundiyan bes vekirina bîrêne sonda-jê ne. Nexwe ew jî dizanîn bi riya musluxan kişandina avê ya malan, ji bo wan xeyal e. Dewleta Tirk ji birina xizmeteke wiha bêtir, ji bo ku umrê sistema xwe ya kolonyalist hîn dirêjtir bike tedbirê leşkerî digre.



## Zimanê Kurdî

Seydayê Ehmedê Xanî, berî niha bi sê sed salan, di "Mem û Zîn" de, gotiye;

*Da xelk nebêjin ku Ekrad  
Bê meerifet in, bê esil û binyad  
Enwaî mîlet xudan kitêb in  
Kurmanc tenê di bê hesêb in  
Hem ehlê nezere nebênu ku  
Kurmanc*

*Isqek ne kirin bo xwe amanc*

İşqa ku Seyda behs dike kitêbên Kurdî ye, nivisina bi zimanê Kurdî ye, bi zimanê Kurdî kitab afirandin e... Nemiriya Seydayê Ehmedê Xanî ji vir tê: wî bi Kurdî, bi zimanê zikmakî, bi gotinêne bav û kalan nivisi. Wî peyv û gotinêne Kurdî mîna gewher, lûlû û yaqûd li ser kaxi-zîn spî resandin, şewq û ronahîya peyv û gotinêne Kurdî bi her aliyê welêt gîhandin. Wî, mîna zîvkirekî, peyv û gotinêne Kurdî hûnandin, neqîsandin, peyv û gotinêne Kurdî li hev anîn û pê erseren abadîn afirandin. Wî ji peyv û gotinêne Kurdî lehiyekê nemir ava kir... û ya herî girîng, rî li ber nîşen nû rast kir.

◆◆◆

Herweki tê zanîn, berî niha bi çend heftan, li Tirkîye, Serok-komarê Tirkîye Turgut Ozal û gelek giregirêne dewleta Tirkîye li ser zimanê Kurdî peyivîn û behsa serbestkirina zimanê Kurdî kirin. Gelo ew dixwazin ci bîkin? Ew ci difikirin, bi ci awayî dixwazin rî bidin zimanê Kurdî û nivisina wî... Em hê baş bi vê yekê nîzanin. Lî ev munaqaşê û gotubêjîn dawîn dîsan, ca-reke din, yek ji wezîfîn herî girîng ên Kurdan(nemaze ên ronakbîrê Kurdan) pêşberî me kir: Kurd div li zimanê Kurdî xwedî derkevin, pê bixwînîn û binivisi, wî pêşve bibin. Bêgu-man, gelek girîng e ku meriv bizanibe ka dewleta Tirk ci û çawan difikire. Pir û pir girîng e ku serbestî û azadiyek ji bo zimanê Kurdî were pê. Lî girîngti-rîn tişt ew e ku Kurd bi xwe li zimanê xwe xwedî derkevin, zimanê xwe mîna nan û ava xwe biparêzin, pê bijn.

Em hemû pê dizanîn ku gelek tevgerên Kurdî û ronakbîrên Kurd, bi xurtî, li zimanê xwe xwedî derkevin, pê naopeyivin, pê nanivisîn. Ew rizgarî û ser-bestiya zimanê Kurdî dihêlin pey "şoreşa mezîn". Ecêba mezîn ev e; ew ji bo "Kurdistanekî yekbûyî û xweser" şer dikan, dixebeitin, lê kar, xebat û tevgerên xwe ne bi zimanê xwe, bi zimanekî biyanî, bi rî dibin... Ma li vê derê kîmânîyek, şasi-

pê ve, dikare ci tişte hêjatir hebe?

Nemaze ji bo me Kurdên Tirkîye, Suriyê, Lubnan û Yekitiya Sowyetî, bi Kurdî peyivîn, nivisîn û fikirîn pêwistiya herî mezîn e. Ji ber ku, ji her kesî bêtir, em li ber xetera asimilasyon û windabûnê ne, em di bin bandûr û tesîra zimanên biyanî de ne. Gava em li zimanê xwe vegerin, hingê em û xwe û şexsiyeta xwe ji vegerin. Em û di ruh û şexsiyeta xwe de guherînîn mezîn û pîroz bînîn pê. Ma ji destê kesê bêşexsiyet ci tê? Ew dikare ci bike, ci biafirîne?.. Ma kesê ku bi şexsiyeta xwe, bi huwiyyeta xwe ya nete-weyî, bi ziman û çanda xwe bawer nebe, baş bi wan nizanibe, dikare mîna Seydayê E. Xanî berhem û escerên abadîn biafi rîne?

Bi Kurdî fikirîn, nivisîn û afîrin tevgerêne pîroz, heyecaneke boş û kîfxweşîyeke bêpavan e. Ji ber ku bi Kurdî nivisîn, fi-kirîn û afîrin li hember qirêjî û gemariya serdest û zordaran rawestîn e, li hember bêdengî û bêrûmetiyê serfîldan e, li hember tîrs û şermzariyê qirîna bawerîye ye, li hember derew û sextekariyê alaya rastiyê hildan e; xweşî, germahî û paqîjî ye; rûmet e.

Serokên dewleta Tirkîye, pir caran, dibêjîn ku zimanê Kurdî nîn e. Ew iddiâa dikan ku zimanê Kurdî devokeke Tirkî ye. Çima ew van gotinan dikan? Ji ber ku ew dizanîn; em Kurd li zimanê xwe xwedî dernakevin, pê na-xwînîn û pê nanivisîn. Ew dizanîn ku kesen ku bi zimanê Kurdî nivisîne û dinivisîn, bi tiliyên destan tênejmartin, roj-name, kovar û kitabêne Kurdî pir hindik in. Eger bi sedan nivîskar-în Kurd hebûna, kitabxanêne me hebûna û ew bi kitêbene Kurdî ti-jî bûna, rojnamen me pir bûna û ew bihatina xwendin, zimanê tevgerêne me yên civakî, siyâşî û ronakbîrî Kurdî bûya, gelo wan û dîsan van gotinan bigotina û van iddiâyan bikirina?.. Ew dizanîn ku piraniya me ji eşqa ku Seydayê Xanî behs dike, dûr in. Ew dizanîn ku "enwayî melet xudan kitêb in, Kurmanc tenê di bê hesêb in." Ji ber vê yekê ye ku ew herçend behsa Kurdan û zimanê Kurdî jî bikin, bi hê-sanî, zimanê Kurdî dixin qalib û kiraseki pênc peran.

Rûmet û bêrûmetî, rûgeşî û rûreşî, serfirazî û bindestî û hwd bi hev re ne. Ew du aliyê tiştan in û pir caran sînor jî di navbera wan de ne zelal û ne diyar e. Bi bawerîya min zimanê Kurdî vê sînorê diyar û zelal dike. Çima Seydayê Xanî bû nemir? Ew bû nemir, ji ber ku ew li aliyê rûmet, rûgeşî û serfirazî yê sînorê bû. Ew bû nemir, berhem û ese-reñ wî bûn nemir. Lî mixabin ku xewna wî jî hê nemir e. Xewna wî rûmet, rûgeşî û serfiraziya zimanê Kurdî bû.

Em divê ji bîr nekin; xewna Seydayê Xanî hê jî xewn e û iroj jî derbas dibe.

# Di şerê Xelîcê de divê siyaseta Kurdan ci be? Di şerê X

**Li ser şerê Xelîcê me ji hin şexs û rëxistinan pirsa "Di şerê Xelîcê de divê siyaseta Kurdan ci be?" kir. Bersivênu ku ji me re hatine, em gişan diweşinin.**

**Yên ku bersiv nedan ev in: PDK- Iraq, PDK- Iran, Yekiti Niştiyanî Kurdistan, HSK, PASOK, Dr. Naci Kutlay, Orhan Kotan, Mustafa Duzgun û İkram Delen**

**Serhad Dicle (PPKK)**

## "Şerê Kurdan heta rejima Saddam bê xistin wê dom bike"

Herçiqas di rû re şerê Xelîcê wek şerekî navbera rejima Iraqi û tifqa navnetewî ya di serokatiya Amerika de xwiya dike ji di esasi de dualitiya şer ne ewqas zelal e. Rastî ew e ku di şer de gelek ali û gelek armancen cihê hene. Her weki Fransizi ji li gel mutefikan bomban li ser Iraqê ditarin lê besdarbûna Fransizan li dijî Iraqê zêdetir li hember hukum-dariya tikûtenya ya Amerika ye. Gelek welatîn din ji bi vê armancen di şer de ne. Tirkîye xwedê giravî li dijî Iraqê di şer de ye, lê armanca wê ya esasi ew e ku rê li dijminen ber rejima Sedam; Kurdan bigre. Kurd ji ji mêt ve li dijî rejima Sedam şer dikirin û ev şerê wan iro ji dom dike.

Bi rojhilat û rojavayê xwe dewletîn mezin ên dinê bi destê xwe li Iraqê canawarek derxistibûn, lê canawar ji zeftê derket, iro gelekîn wan dixwazin vî canawarı ji holê rakin yan ji têxin zeftê. Helbet ne wazifa gele Kurd e ku bêje em li dij in ku hûn vî canawarı ji holê rakin yan ji têxin zeftê. Kurd bi xwe berî her kesi di têkoşina xistina vê rejima canawar de bûn û heta ev armanci bi serkeve, gelek tebii ye ku Kurd şerê xwe bidominin.

Ji ali din her çiqas armancen hêzên mutefik ên navnetewî xwiya ne ji di mesela mili ya Kurd de ew bêdeng in. Ji devla behsa masen milete Kurd bikin, alikari û piştgiriyen leşkeri, abori û siyasi pêşkeshi dewletîn dijminen Kurd dike. Gava siyaset ev be Kurd nikarin tu cari baweriya xwe bi beyanen wan ên li ser mafê hukumraniya miletan, masen mirovayı, demokrasi û edaletê binin. Divê berî her tiştî baweriya xwe bi têkoşin û yekitiya xwe binin, bi hebûn û hêza xwe doza xwe bi wan bidin qebûlkin ku heta mesela mili ya Kurd hel nebe aştiyek adil û bi istikrar nayê navça Rojhilatanavîn.

Divê em xebatek wilo bikin ku pirsa Kurdi ya hemû perçen Kurdistanê di konferansa navnetewî de ya ji bo Rojhilateye ciye xwe bigre. Lê ji ali din divê em hemû hêviyên xwe li benda wê konferansê nehelin, ji nuha ve têkoşina xwe bilind bikin. Bi taybeti li Kurdistanâ Iraqê berî Konferansê Kurd divê Kurdistanâ azad bikin, eger ne wiha be, dibe ku qet mesele neyê konferansê ji.

## "Tevgera Kurd divê rê nede ku Helepçeyeke nuh çêbibe"

Krixa Xelîcê neticeya îşxala Kuwetê ye. Helkirina gelşê ew e ku rejima Iraqê hêzên xwe ji Kuwetê vekşîne. Partiya me di derbareyi vê kirizê de piştgiriyen biryaren Koma Miletan dike.

Partiyen Kurd divê ji vê rewşa taybeti seydê bigrin ji bo ku karibin li her aliye dinyayê rewşa xwe ya diplomatik û siyasi xurt bikin. Divê ew ji dewlet û organizasyonen navnetewî daxwaz bikin ku di warê siyasi de wan nas bikin.

Partiyen Kurd ji hemû perçen Kurdistanâ divê nuha di bin ala organizasyonek de ji bo hevkariya siyasi, diplomatik, informasyonî û piştgiriyen hêzên xwe bikin ye.

Tevgera Kurd divê serxwebûna xwe biparêze û rê nede ku

Helepçeyeke nuh çêbibe. Menfeeta gelê Kurd di wê siyasete de ye ku divê hêzên Kurd opozisyonike pîr ekstrem negrin. Dîrok û tecrûbeyen me yên nuh ji ispat dike ku opozisyonen wiha li zirara Kurdan bûye.

Piştgiriyen esasî divê li her perçê Kurdistanâ di nav gelê Kurd bête gerandin. Qet menfeeta Kurdan tuneye ku xwe di kirîza Xelîcê bigerînin, ku ji xwe bi tu hawî ew nikarin bi hawakî direkt tesîre lê bikin. Di eyîn wextê de partiya me ji ber kuştina sivîlan gelek mutteesir e.

**Azad Xafaf  
Endamê Buraya  
Politîk ya PDGK-I**

**Kemal Bürkay (PSKT)**

## "Di şerê Xelîcê de Kurd ne teref in"

Di şerê Xelîcê de Kurd ne teref in. Seddamê zordest Kuveytê dagirt û ev yek bû sedemê şer. Amerika û hevalbendê xwe ji bo maflîn xwe, xasima ji bo nifta erzan şer dikin.

Herdu ali ji cehd dikin Kurdan bikişinin ba xwe. Seddam dicerebîne ku pêwendiyen xwe bi Kurdan re xweş bike. Amerika û hevalbendê xwe ji dixwazin Kurdan li bakur bikine şer û barê xwe li başûr sivik bikin. Lî divê Kurd hişyar bin, di vê demê de nekevine şer. Hêzên wan ne mezin e, yê heyî ji divê ji bo xelkê telef nekin.

Kurd di şerê Xelîcê de ne teref in, lê şer zirara xwe dide Kurdan û

Kurdistanê ji. Eger Tirkîye û Iran bikevine şer Kurd wê zêdetir zirârê bibinîn.

Li aliye din, ev şer rewşa Rojhilata Navîn wê geleki biguhurîne û bibê nebê, tesirekî li ser pirsa Kurd ji bike. Şer çawa dighê dawî meriv nizane. Eger sazûmane Seddam hilweise û li cî sazûmaneke demokrat çêbe bo Kurdan baş dibe. Hingê xelkê Kurdistanâ Iraqê dikare vegere cî û warê xwe û bi aliye siyasi û leşkerî baş rês be. Giraniya Kurdan li Iraqê wê zêde be. Hingê Kurd, eger nikarin dewleteke serbixwe avakin ji - ev yek ne tenê girêdayî daxwaza wan e, girêdayî hêza wan e û rewşa mintiqê û din-

yayê bi tevayî ye- dikarin otonomîyeke bi rastî bistînin. Heya dibe ku, bo avakirina federasyoneke bi du cumhûriyet rê vebe.

İhtîmaleke mezin e ku pişti şer konferanse nevnetewî çêbe ji bo safikirina pirsên Rojhilata Navîn. Divê em hêzên Kurd kar û xebateke baş bikin ku pirsa Kurdi ji di vê konferansê de cî bigre û nûneren Kurdan ji tevlî bin, ray û daxwaza xwe bêjin. Bo vê yekê siyaseteke baş, kar û xebateke baş divê. Da ku, him li welat yekîtiya hêzên welatparêz bê şidandin, gelê me dengê xwe bo heq û azadiyên xwe bilind bike, him ji li der welat kar û xebateke baş bê kirin bo nasandina pirsa Kurdi û bo stendina piştgiriyê.

Bo van hemû karan divê di nav hêzên herçar perçeyan de pêwendî bê xurtkiran, tim danûstinden û koordinasyon hebe



bibin hevalbendê Seddam. Ev li dijî mantiq û realîta jiyanê ye. Ü ji xwe berî şerê Xelîcê Kurd dijminen Seddam in. Dibe ku carna berjewendiyen Kurdistan û terefîn din peraleli hev bin, ev normal e. Dibe gava pêşî Kurd giraniya xwe bidin ser Kurdistanâ Iraqê û li gor wê planen praktîkî deynin, lê nabe politîk Kurdistanî ji bîr bikin.

Ma bêmaf bêrûmetî li ser eniya Kurdan hatiye nivîsandin! Ma heta kengî emê xebata bêber û nejîhatî bikin? Otoriteyeke Kurdi yekbûyi tê xwestin. Aksiyon, çalakî ji Kurden derî welat tê xwestin. Dengê Kurd ê serbixwe bi xurtî bîghê cîhanê. Ji bo pirsa Kurdi nemîne wek pirsên hun dirê welatê dagirker, mafê çarenûse Kurd têkeve rojeva NY û hemû civînen li ser Rojhilata Navîn.

**Sipan  
Rêxistina Ewrûpa ya  
Partiya Hevgirtina Gel li  
Sûriyê**

Tevgera Kurda divê rê nede ku Helepçeyeke nuh çêbibe. Menfeeta gelê Kurd di wê siyasete de ye ku divê hêzên Kurd opozisyonike pîr ekstrem negrin. Dîrok û tecrûbeyen me yên nuh ji ispat dike ku opozisyonen wiha li zirara Kurdan bûye.

Piştgiriyen esasî divê li her perçê Kurdistanâ di nav gelê Kurd bête gerandin. Qet menfeeta Kurdan tuneye ku xwe di kirîza Xelîcê bigerînin, ku ji xwe bi tu hawî ew nikarin bi hawakî direkt tesîre lê bikin. Di eyîn wextê de partiya me ji ber kuştina sivîlan gelek mutteesir e.

Tevgera Kurda divê serxwebûna xwe biparêze û rê nede ku

# cê de divê siyaseta Kurdan ci be? Di şerê Xelîcê de divê

**İbrahim Guçlu:**

## "Hilweşandina Rejima Seddam pêwîst e!"

Li Xelîcê, li derveyî îrada miletê Kurd şer dest pê kir û iro ji berdewam e. Di şer de du teref hene. Terefek Iraq e û teref din jî di bin serekatiya DYA'ê de dewletên Koma Miletan e.

Iraq ji sala 1960'ı (4 sal xarîç) û heta iro li hember miletê Kurd şerekî neheq didomine: Welatê me bi çekêñ kîmyayî wêran kir, jahr bi ser de barand, vala kir û bi deh hezaran Kurd kuşt. Dîsa di vê demê de di destpêka êrişa xwe de li hemberê Iranê, 8 sala şerekî din domand. Demeke dirêj derbas nebû, welatekî Ereban îşxal kir. Van bûyerên girîng

îspat kir, ku Iraq şerxwaz û şerfiros e; dixwaze armancê xwe yên kolonyalist bi darê zorê bi cî bîne. Ji bo vê jî, wek tê gotin ne li diji imperializmê ye, bi xwe kolonyalist e.

DYA û dewletên Ewrûpayî him ji bo menfeetên xwe û him jî ji bo menfeatên beşekî Ereban biparêzin di şer de ne. Eger ji heqî û neheqiyê bê behskirin, ev terefa ji Iraqê zêtir xwediyê heq e. Ji bo vê jî, çepêñ Turkiyê û ên din, bi pîvanêñ glover û ên kevn, di vê pîrsê de jî xwiya dike ku nikarin hemdemî hereket bikin û bi kirininê xwe ji Seddamê xwînrêj û nîjaderest re xizme-

tê dikin.

Di şerê Xelîcê de, dijminê gelê Kurd yê sereke û stratejik Iraq e. Pêwîst e ku daxwaziya gel û welatparêzên Kurd şikandina pî û baskêñ diktatoriya Seddam û hilweşandina rejima Iraqê be. Di vê de jî dewletên Koma Miletan roleke konkrêt dilize. Xwiya ye ku menfeeta gelê Kurd bi giştî bi siyaseta dewletên Koma Miletan re ye.

Ji bo vê jî pêwîst e ku welatparêz û rîexistenê Kurd;

1- Ji bo hilweşandina rejima Iraqê kar bikin. Pirsa Kurdistanâ Başûr bikin xeleka merkezî û ji bo ku pirsa Kurdistanâ bi giştî çareser bibe divê projan

pêkbînin.

2- Di van şertan de, terebûna xwe di warê siyasi de diyar bikin, bi leşkerî-fîili nebin terefê şer. Rojén pêş: iro, taktika ku Cepha Kurdistanâ Iraqê dimeşine pozitîv xwiya dike.

3- Di Rojhilata Navîn de, ji bo aştiyê û nîzameka demokratik miletê Kurd unsûrekî gelek bingehî ye. Ji bo ku pirsa miletê Kurd, di konferansa navnetewi de bibe pirsek û neteweyê Kurd bi berpirsiyaren xwe ve bibin teref û armancê xwe bînîn zimêñ, pêwîst e ku ji bo damezirandina otoriteyeke siyasi yekgirtî a Kurdistanâ gavbîn aveti.

4- Pêwîst e ku bi platformen navnetewi û demokrat re û bi dewletên enteresa wan bi pirsa Kurdi re heye pêwendî bîn danin.

**Umer Şêxmûs:**

## "Gelê Kurd gerek hêz û imkanen xwe bike yek û dawa mafênen xwe yên milî û demokratik bike"

1- Hêzên Kurdistanâ gerek li diji dagirkirina Kuveytê bisekinin û dawa bikin ku Iraq ji Kuveytê vekiye.

2- Hêzên Kurdistanâ gerek dawa hilanîna rejima faşist ya Seddam û anîna rejimeke demokrat li gora daxwaziyen hêzên opozisyonâ Iraqê bikin.

3- Hêzên Kurdistanâ gerek piştgiriya biryarek Netewê Yekbûyî bikin.

4- Gerek hêzên Kurdistanâ bi yek dengî gavêñ fireh bi piranya hukumet, dewlet û dezgehîn nevnetewi re ji bo mesela Kurdistanâ jî wek mesela Filistinê têkeve rojeva konferansa cihanî ku hemû kes bahs dikin bavêjin. Û ji bo mesela Kurdistanâ doza helkirina adil bikin.

5- Gelê Kurd gerek hêz û imkanen xwe bike yek û dawa mafênen xwe yên milî û demokratik bike. Ev yekîti û koordinasyon gerek di nav hemû hêzên Kurdistanâ de pêk bê. (bi kîmanî di navbera hêzên mezin û bi nîfûz de) gerek ev karê han ji pêş 6-7 mehan bîhata kirin.

6- Tevgera Kurdi divê bi xurtî û bi jîritî kar bike ku ji guhertinê paş şerê Xelîcê dîsa destvala dernekeve, ku dijminen gelê Kurd tiştekî wiha dixwazin.

7- Hêzên Kurdistanâ gerek dawa çêkirina konferanseke navnetewi li ser mesela Rojhilata Navîn bikin ku mafênen gelê Filistin û Kurdistanâ jî divê di nav de be.

8- Pir mixabin vê carê jî sinorêñ dewletên Rojhilata Navîn nayêñ guhertin. Ji lewra gelê Kurd gerek bi xurtî di nav sînorêñ wan welatên ku tê de diji li ser bingeha sistemeke federalî, yan otonomî dawa mafê çarenusa xwe bike .

9- Gelê Kurd gerek dawa bike ku şer bête sekinandin û hemû navçe bibe herêmekê azad ji çekêñ atomî û mehtêñ cihanî êdi çekan nefroşin dewletên Rojhilata Navîn û hemû çekêñ kîmyayı, biyolojî û atomî bîn xera kirin.

10- Damezirandina rejima demokratik û puluralist li hemû herêmê û bo kutkirina rejimên despot û feodal û diktator.

11- Damezirandina komsiyoneke ekonomik û bazareke yekgirtî û banqeqe herêmî ji bo dabeşkirina dewlemendiya hemû herêmê (petrol, av, içareya malî) û piştgiriya projen ekonomî ji bo pêşvebirina standartên hemû welatan.



**A. Rêbaz (KUK- SE)**

## "Şer şerekî neheq û paşverû ye"

Berî ku em li ser politika Kurdan ya di derheq şerî Delavê de bipeyivin, divê li ser şer bi xwe hînek noqte bîn zelalkirin. Diyar e ku şerî Delavê encama gayışkısandina navbera talankaran e ji bo berjewendiyen xwe yên li deverê. Armanca her du alîyan jî, qayimkirina cihê piyêñ xwe, kontrola deverê û talana dewlemdiyen wê ye. Şer şerekî neheq û paşverû ye. Lewra daxwaza her du alîyan jî ne xizmeta gelê Kurd e. Alîyêñ ku şer dikin dijminen gelênever û yên gelê Kurd in. Ji ber vê yekê arîkarî, yan jî tagirîya alîyakî ne wezifa me ye, lê berevajî, divê li diji tev alîyê û têkoşîn bête dan.

Rêveberîya Seddam paşverû û tuxumperest e, qatil û dijminen gelê Kurd e. Li alî din di dîroka mirovâyî de nehatîye dîtin ku emperyalizmê tu caran azadî û kamûranî pêşkêsi gelan kiriye. Vajîya vê, emperyalizm zulum û

kedxwariyê bi xwe re tîne. Bindestî û koletî her tim bi emperyalizmê re bûne. Emperyalizm celadê edalet û azadîye ye. Eger iro Kurdistan hatîye perçekirin, zincîra koletîyê di hustiyê gelê Kurd de ye û di bin zulma kolonyalizmê de jiyan lê hatîye jehir kîrin, sedem û berpirsiyare emperyalizma rojava ye. Emperyalizm dijminê gelê Kurd û yê tev gelan e.

Emperyalizmê, Seddam rîgir ji bo berjewendiyen xwe anî vî cihî û li ser pişta wî bi mîlyaran dolar qezenc kîrin. Nuha dema dixwaze Seddam nehîle, armanc her a berê ye û dîsa bi mîlyaran dolar dije bîrîkîn wê. Bi tenê talan û feyde di bala emperyalizmê de ye. Tiştîn ku hatîne şerî gelê Kurd û wê bîne serî, ne xema wê ye. Ez dixwazim vê yekê bibêjim;

Tîştek bê sebeb nayê kîrin. Kes bê armanc gavekê bi tenê jî navêye. Her yek dixwaze alîyê û

ji bo berjewendiyen xwe bi kar bîne. Divê, di vê çarçevê de li rewşa Kurdan, li daxwazên ku ji bo Kurdan têñ gotin, bête nîrîn. Eger mîrov bi vî çavî li bûyerê binêre, polîtîkaya ku divê Kurd li dûv biçin xuya dibe. Bi ya min;

Berî her tişti divê Kurd yekîtiya xwe ya netewî ava bikin. Ji bona ku Kurd bikarîn, bêyi ku bibin aleter destê xelkê, polîtîkaya ke serbixwe, li gor berjewendiyen xwe bajon, divê pişta xwe bidin hêza gelê xwe; divê her perçeyek di nav xwe de û di navbera hemû perçan de berfirehîrîn yekîtiya netewî, bêyi windakîrîna wextê, bi cih bike. Bi ya min di vî warî de berpirsiyariya mezin dikeve ser milîn Cebheya Kurdistanâ Iraqê û mixabîn ew, weke ku pêwîst e bi karê xwe ranabe.

-Yekemîn karê li pêsiya Kurdan, rîzgarkîrîna welatê wan yê kolonî ye. Hêzên ku welat dagirkîrîne û yên li piştan in dijmin in. Divê armanc tîştek xebata me berî her kesî ew bin. Li Iraqê yekemîn armanc me divê rîzgarkîrîna vî perçê Kurdistanâ ji bin dagirkîrîna rîveberîya Seddam

be. Dagirkîr bê guhertin armanc wê demê kane bête guhertin.

-Divê rîexistenê welatperwer yê Kurdistanâ Başûr, bi şertê ku mafê çarenivîsa gelê Kurd nas bikin, bi komunîst û hêzên demokrat û şoreşer ên Ereb û kîmeneteweyen din re li riyen hevkariyê bigerin.

-Li platformen navnetewi ku li ser problemen deverê têne peyivîn, divê Kurd wek aliyeke amade bibin. Ji bo vê yekîti xebatê aktif û hevpişk pêwîst in. Divê bixebeitin ku problem wek problema Kurdistanâ perçekirî, parkirî bête rojêvî. Divê eşkere û bi israr bê nîşandan ku li ser koletî û bindestiya neteweyekî 30 milyonî li deverê aşî û aramî peyda nabe û her çareya ku Kurdan li derivebihêle ne meşrû ye. Bi bawerîya min divê tev rî û imkan li diji daxwazên ku Kurdan li derveyî meselê dihêlin, bêne bi kar anîn û divê Kurd vekirî xuya bikin ku ew ji bo mafênen xwe desten xwe li ber kesî venakin û rî jî nadîn ku mafênen wan di bin piyan de bêne perçiqandin.



**Ebdulah Peşew:**

# "Edeba Kurdi Li Mihaciriyê Sêwî ye"

Nüçegîhanê me yê Moskovayê Bave Nazê bi şairê me yê bî nav û deng Ebdulah Peşew re ev hevpeyivîna hêja çêkir.

**Armanc:** Li gel ku tu li Kurdistanê şairekî bi nav û deng i ji, lê mixabin ji ber gelek sedemê ku tu bi xwe pê dizanî, berhemên te li hemû perçeyen welêt belav nebûne. Ji ber vê yekê her xwendevan jiyanate ya edebî nas nake. Loma ji emê ji vê pirsê dest bi hevpeyivîna xwe bikin. Kak Ebdulah ji kerema xwe re tu dikarî bi kurtî li ser xwe û jiyanâ xwe ya edebî bipeyî?

E. P. : Di sala 1946 yan ji di sala 1947'an de(tevi ku ez nizanî) li gundekî nêzî Hewlerê - Bêrket- ji dayika xwe bûme. Malbata me oldar(dînî) bû. Di temenê du salî de min bavê xwe winda kir. Hîç ez naxwazim zaroktiya xwe bi bîr bînim. Ew wilo tal û dijwar bû, heya dihêle ez neynim ber çavêx xwe. Gava bi şev tê bîra min ez jê direvîm.

Ez li bajarê Hewlîrê, li nik mala mamê xwe jiyan û cûm xwendina dibistanê.

Sala 1961'ê min qesida xwe ya yekem nivîsand. Û di sala 1963'an de di kovara "Hewlîr" de di hejmara wê ya herî dawî de (jê pê ve hate girtin, diyar e min serê kovare xwar û derî lê girt) qesidak min cara pêşîn hate weşandin.

## Zaroktiya min tal bû, ez naxwazim bi bîra xwe bînim...

Şairîn ku tesîra wan di wê demê de li min hebûn. Hecî Qadir û Melayê Gewre bûn. Bi xwe berhemên Hecî Qadir hestê Kurdayetiyê bi min re çêkir.

Payîza sala 1963'an, ez tevi şoressê bûm. Lê di qonaxa hukmê Arif de, bi pêla guftugoya şoressê re ez vegeiyam Hewlîrê û min disa xwendina xwe domand. Erê ez wexteke pirr hindik di nav şoressê de mam, lê şopa wê di dilê min de ma û ji bo min bû tecrûbak mezin. Û êdî min bi çavê xwe dît ku Kurdistan welitekî dagirbûye... Ji ber vê yekê ji min di hundî PDK û de ciyê xwe girt û min dest bi xebata siyasi kir.

Ji ber ku çapemeniya Kurdi di wê wextê de tunebû, şîrîn min bi riya rîexistin, partî û di munasebeten qewmî de belav dibûn.. Û nivîsîn min yên(salê 1961-1965'an) wîndâ bûn, çîmkî carekî polis girte ser mala me, da ew nekevin nav lepêwan min destêrên xwe hemû şewitandin. Li gel ku nivîsîn min yên wê heyamê hîn xav bûn ji, lê ku di destê min de bimana, minê îstîfadeyek baş ji wan bidîta.

Dîwana min a yekem di sala 1967'an de bi navê "Firmesk û

Zam" (Hêsisir û Birîn) belav bû. Şîrîn wê diwanê niştîmanî û evîni bûn. Zor sade bûn.

Dûre min bêtir zor da xwendina klasikên me. Min berhemên Cizîri, Xanî, Nalî û Wefayî xwend. Û şairîn klasikê serdema me, Goran tesîrek mezîn li min kir.

**Armanc:** Tê wê manê ku te qesidêñ xwe, di wê demê de bi awakî teqlîdî dinivîsand?

E. P. : Erê. Û dîwana min ya duym jî ku di sala 1968'an de li Kerkûkê di bin navê "Bîti Şikaw" (Senemê Şikestî) belav bûbû, qesidêñ wê hîn ne xerû serbest bûn.

Dîwana sîyem "Şewnameyi Şairekî Tinû" (Namê Şavan ên Şairekî Tî). Di sala 1972'an de li Bexdayê belav bû. Qesidêñ min ên vê diwanê hemû bi rengê serbest hatine nivîsin. Di vir de ez dikarim bibêjim ku ji jiyanâ min qonaxa duym a edebî ji vê diwanê dest pêkir. Ev bûye 18 sal ku ev dîwan belav bûye. Lê gelek qesidêñ wê li ber dilê min yên herî şerîn in.

**Armanc:** Kak Ebdulah weki em pê dizanîn "12 Name ji bo Minalekan" ji berhemên te yên wê demê ne. Gelo çîma belav nebûne?

E. P. : Dîroka wan pirr dirêj e... Ji wan 12 naman tenê du name di "Şewnameyi Şairekî Tinû" de belav bûn. Jê pê ve li welat ne kovar û ne rojnaman rî nedan wan. Û pêla ku min ew di mîhrîcanê şairî de xwend serfîji min re çê kirin.. Lê belê di sala 1979'an de ev "12 name" li Berlinê belav bûn.

Dîwana çarem "Şewniye Xewnatan pêwe nebînim" (Şev Tuneye ku Hûn Nêyên Xewna Min) di sala 1980'an de li Bexdayê belav bû.

Ev dîwan ji du beşen qesidân pêk hatiye. Beşek jê, ji qesidêñ ku li welêt di fitra 1969-1973'an de, min nivîsbûn tê û besê din ji qesidêñ ku di hundîrê salê 1973-1979'an de ku li derveyî welêt hatine nivîsandin. Ji ber ku ev dîwan li Bexdayê hatibû weşandin riqabetê(sansorê) gelek malikên wê xistiye bin meqesê...

Dîwana min "Sedan Salan" wek buroşûrekê li Ewrûpa belav bû...

**Armanc:** Tu dibêjî ku ji dîwana te ya sîyem. qunaxek nuh ji edeba te dest pê kir. Gelo ev di bin tesîra girûbêñ edebî ku çê bûbûn an jî di bin tesîra xwenasîna qewmî ya bilind de ku di wê heyamê de peyda bûbû, hişt ku tu bi awakî din binivîsi?

E. P. : Bê guman , ji ber cewê siyasi tê. Ew girûbêñ edebî



**Ebdulah Peşew:** Ku ez ne şâr bûma, her ezê bi giyana xwe şâr bûma.

ku hebûn ji, wek reaksiyonâ siyasi bûn..

**Armanc:** Mebesta te ji "Cewê Siyasi" peymana 11'ê Adarê ye?"

E. P. : Erê. Di nîrîna min de 11'ê Adarê lêdanek ji bo Kurdan bû.. Peymana Adarê hatibû rabirdana muzaefeti şoreşê bi xwe bû. Bi xwe ev peyman ne ji armancê şoreşê bû. Pêşmerge hatin kuştin ne ji bo ku gundêñ hatibûn şewetandin ji nuh ve ava bikin. Heger hedef pê ev bûya, êdi şoreş ne pêwîst bû, û wê Gund nehatina şewetandin. Tê wê manê xeziya gel di ber mafê wî yê qewmî de bû. Û bi 11'ê Adarê ev maf nehate stendin.

**Armanc:** Baş e, tevi vê ji pişî 11'ê Adarê edeba Kurdi gavên ciddî bi pêşde avêtin. Tu vî tişî çawa dîbîni? Dîjîti di vir de nîne?

E. P. : Na. Erê armanca şoreşê ya gişî neçû seri. Erê hêviya Kurdekkî besit ji bo mafen wî bi cih nehat. Lê belê meydanek firesh li ber edeba Kurdi vebû. Azadiya nisbî hişt ew geş bibe. Em dikarin bibêjin ku nîvî milet li çiya di bin darê silehê de bûn û nîvî wî yê din şîr digot û guhdeyya wan dikir.

Di vir de, ezzê dîsa vegeyim ser cewê gişî. Bi taybetî cewê siyasi û yê edebî hişt ku çend girûbêñ edebî çê bibin. Çawa ku di nav Kurdan de du cereyanen (xet, rîbaz) mezin yê siyasi hebûn; cereyan qewmî û ya ümûmî wilo ji cereyanen edebî hebûn. Ev grübêñ edebî di feleka herdu partîyên (Partî û Komünîst) siyasi de dixerian. Lê ji bili wan girûbek serbixwe hebûn. Di vê cereyanê de gelek nîrîn rengo-rengo hebûn. Armanca vê rîbazê ew bû ku xwînek nuh di damarên edeba Kurdi de bigere. Û bi vê siyâne tevgerê edebî nuh di bin navê

"Ruwange" hate damezirandin. Piraniya edibên vê tevgerê temûrid li ser edebê Kurdi yê teqlîdî û rewşa siyasi kirin. Û berehemên xwe di bin tesîra medresen nuh ên di edeba Ewrûpî û Erebî de(bi taybetî edeba Fransî û tevgera edebî li Iraqî ya bi navê şîrîn 1969'an) dinivîsandin. Bi saya vê herekê, temûmî(nenasî) di şîrîn Kurdi de peyda bû. Erê di edeba Kurdi ya klasikî de karbûn hebû, lê belê ximûz(nebelû) tunebû.

**Armanc:** Mebesta te ji ximûzê yan temûmijê remziyet(sembolizm) yan abstraksiyonizm e?

E. P. : Mebesta min ji ximûzê windabûn û windabûn ne remziyet e. Ew rengekî ji bêmeniyetê ye. Remziyet di edeb de, bi miste ye xwendevan dikare lûxzê bibîne û fam bike. Lê ximûz ji bo ximûzê nayê fam kîrin. Ew tenê bi awakî mustenî qesidê aloz dike. Û ev tiş ziyanê digine edeb. Lê tevi wiha ji vê cereyanê çend şairîn bi nav û deng dane me.

**Armanc:** Û tu bi xwe ne ji "Ruwange" bû.

A. P. : Ez bi xwe ne endamê "Ruwange" bûm. Min îmza xwe navêt bin programa wê. Lê ne ku ez ji wan dûr bûm. Pêwendiyen min ên xurt li gel wan hebûn. Û min di kovara wan de nivîsen xwe belav dikir...

**Armanc:** Em dikarin niha bibêjin ku şîrê serbest yê baw e (saide)?

E. P. : Helbet

**Armanc:** Heger em qonaxa niha û ya salê 70-ê deyinin ber hev, em dikarin çi di der heqa herdu qonaxan de bi peyivin?

E. P. : Şîrîn Kurdi di salê 70'î de dihîgîst edresa xwe. Şairîn Kurd di wê heyamê de,

## Nakewim

Emê wek direx in: Car heye dexewin. Dexewin Wek şîwanî diway sewin. Belam, lê xewîsha Bepêweyn Bepêweyn, nakewin

## Serdekewin

Serdekewin Çunke dwêne Tope qurrêki dest kirdim Daye dest mindalêki Kurd Ew lebatî bûkesûse Tifingêki bîckolaney Lê durust kird!

bixwesta, nexwesta xwe siyasi didit. Ez bi xwe, bi giyanê xwe darî siyasetê me. Lê ji ber rewşa siyasi, min ji neçarî helbesten siyasi nivîsandin. Di wê fitrê de, rewş wiha bûbû ku şairê komunist divê li ser tebeqiyet û umeniyetê binivîse û şairê partî ji li ser têma Kurdayetiyê binivîsine, wê wextê wiha bû. Lê nuha rewş hatiye guhertin.

Roja iro muzaefet nemaye. A niha teqsimek din çê bûye. Yan tu li gel milet û tevgera wî ye yan ji tu li gel hukmetê û dijimin i....

**Armanc:** Carek din em dibînin ku hilbijartina têmê ji mecbûriye. Ma ev tist bi awakî negativ tesîrê li huneriya helbestê nake?

E. P. : Çawa nake!.. Helbet tesîra xwe dike, çimkî şîr zimanê rastiyê ye.

**Armanc:** Di van deh salen dawî de, beşek mezin ji edibên me ji welêt derketin. Gelo em dikarin bibêjin ku edeba Kurdi li mahcîriyê berdewame edeba welêt e?

E. P. : Erê berdewam e û şaxek jê ye. Heger edeba li welêt diyalog e, lê ya li mahcîriyê monologî ye. Û a li welêt germ e lê li mahcîriyê monologyeke hêmen û kû re..

**Armanc:** Mana xwe, em dikarin bibêjin ku edeba Kurdi yê mahcîriyê heye?

E. P. : Hîn di merhela çebûnê de ye. Sîmata(dîmen) wî kin nîne... Edeba Kurdi li mahcîriyê sêwî ye... Meselîn edeba Rûsî li mahcîriyê erê durî welêt bû, lê bi tenêbûna xwe nedîhiye. Ji ber ku li pişta wî müseqeß hebûn.. Lê edibê Kurd ji welat ji qetiye ye û ji gelê xwe ji dûr ketiye. Bi xwe gelê min li mahcîriyê tuneye.

**Armanc:** Û têma te?

E. P. : Têma min ji, hin ji zexîra ku ji welêt bi min re hatiye...

**Armanc:** Tu bi xwe, pê dizanî ku têma bingehîn ji bo edeba li mahcîriyê taseya (nostalgîa) ji bo welêt e. Bi agahdariya min, di warê şîr de, heya niha şâirê me Mueyed Teyib di vî warî de çend qesîde nivîsandiye. Gelo te bi xwe li ser vê yekê tiştek nivîsiye?

**A. P. :** Erê, gelek.

**Armanc:** Ji wan.

**A. P. :** Eger em care bêmewe "Heger ez, vê carê bêm" "Şewniwêjî Namoyan" (Nimêja şeva ya xerîban").

**Armanc:** Bi xwe nexweşîya min e, ez nikarim vê pîrsê nekim. Gelo çîma nivîskarênu bi netewa xwe Kurd in, Lî bi zimanê Kurdî nanivisi (wek Yaşar Kemal, Yilmaz Guney, L. Abdûlmejid, M. Mesûd, Selîm Berekat) çîrok û romanên wan bi seviyek bilind hatine nivîsandin, lê belê nivîskarênu Kurd ku bi zimanê Kurdî dinivini, berhemên wan xav in û di seviyek pîrr nizm de ne?

**E. P. :** Heger tu dîna xwe bîdi şîra Kurdi, tu yê bibînî ku ji mîj ve ew bi awakî nivîsi bûye teqlid û ketiye nav mîlet û heya roja iro ev zincir neqetiyaye û her berde-wam e. Lî çîrok û roman di nav Kurdan de teqlideke taze ye. Ji Ewrûpa hatine herêmê. Kessênu bi Türkî yan bi Erebî dinivisin nêzî çavkaniyê ne. Bi xwe zimanê proset(nesrê) zimanekî xwe yê taybetî heye. Zimanê Erebî û Türkî dikarin ji bin vî warî rabin. Lî zimanê me yê romanen hîn di qonaxa damezirandinê de ye. Lî tevî wiha jî, hin nivîskarênu me wek Husêni Arif bi seviya xwe ne kêmî nivîskarênu herêmê ne...

**Armanc:** Bi xwe, min çîrokên Husêni Arifi bi zimanê Erebî xwendîye, ez nikarim se-wiya wî bikim wek hin çîrok-nivîsîn Erebani(Zekerîya Ta-wîn û Ûsîf İdrîs)

**E. P. :** Diyar e, gunehkariya tercumê ye. Çiroka Husêni Arifi "Gelo Gur" (Kerîyê Gur'an) bi se-wiya xwe ne kêmî yê wan e..

**Armanc:** Baş e. Kek Ebdu-lah, pîrsek taybetî; heger tu ne şair bûya, tu yê ci ba?

**E. P. :** Ku ez ne şair bûma, her ezê bi giyana xwe şair bûma.

**Armanc:** Ma tu şâiriyê wek profesiya(pisporî) dibîni?

**E. P. :** Na, li gel ku carna ew nan dide, lê ez nikarim wek karekî taybetî qebûl bikim. Şîir nimêja di navbera Xwedê û ınsan de ye.

**Armanc:** Ü pîrsa dawî; ev pênc sal in ku xwendevan berhemên te yênu nuh nabîne. Gelo tu nema dinivisi yan tu riya weşandinê nabîni?

**A. P. :** Bi xwe ez nikarim ne-nivîsim. Lî mixabin ji ber durbûna min ji merkezênu Kurdi yênu ku imkanen çapê di desten wan de hene, di van salan de min nikaribû tiştekî xwe biweşanda.

**Armanc:** Kak Ebdu-lah li ser navê Armancê ez sipasî te dikim.

**E. P. :** Ez jî sipasî we dikim û di kar û barê we de serfîrazi dix-wazim.

## Hesen Mizgîn

# Întibayê min ên li ser seyaheta Sovyetê

Di 2'yê meha Çiriya Paşin a 1990'an de ez bi 5 kesen din re (mamosteyek û 4 kandidatên ma-mosten zimanê zikmakî yên Kurdi) çum Yekîtiya Sovyetê. Wek tê zanîn mamosteyen zimanê zikmakî yên Kurdi li tu welaş nika-rin praktîka xwe bikin. Ji ber vê yekê jî berê xwe didin Yekîtiya Sovyetê. Li wir enstituyen ku bi pîrs û pîrsigirêken Kurdan mijûl dîbin, ziyaret dîkin, diçin komar-en ku lê Kurd hene, gund û malbatênu Kurdan ziyaret dîkin, dersen zimanê zikmakî guhda-rin dîkin.

Ez jî bi hêviyek mezin tevlî vê girûba mamostan bûm. Ziyareta me ya Yekîtiya Sovyetê di demek pir bi balkêş û heyecan de bû. Perestroyka û glasnost bi hatina xwe li hemî dinê bûbûn sedema-hin guhertinêng. Min hêvi dîkir ku li Yekîtiya Sovyetê jî van guhertinêng bibînim.

Qonaxa me ya yekemîn bajarê Lenîngradê bû. Otêla (Prî Baltîs-kaya) ku em lê diman gelek luks bû. Di vê otelê de guhertina pere qet ne zor bû. Dema ku me ji hemalê otelê pîrsa îmkana guher-tina peran kir, keniya û dest bi bazara xwe kir. Pişti bîsteke din me li hev kir û hemal çû û bi 3 zilamên din re vege riya hat cem me. Me dolarek bi 15 rublan guhart, lê dotira rojê ji me re hat gotin ku me dolarên xwe erzan firotiye. Pişti 3 hefteyen din ku em vege riyan Moskovayê me dolarek bi 22 rubleyî guhart.

Li otelê keçen ku xwe difrotin gelek bûn. Her tiş bi dolar an jî bi peren Ewrûpi dihat kirinê. Otel herçiqas otelê luks bû, lê ku mirov pere şanî xizmetkarênu otelê dida xizmet di cî de dihat guhartin.

Li bajarê Lenîngradê me beşê Kurdi yê Ensîtuya Rojhilatnasiyê ziyaret kir. Berpirsiyare wê Ordîxanê Celîl bû. Bi rastî min hêvi dîkir ku ezê enstituyeke bi rîk û pêk bibînim. Enstituyek bi arşîv, tije kitêb û malzemeyen din bibînim. Lî hezar mixabin, min odeke bi 3-4 resim, 2-3 dolab, kursî û mase dît, ne tiştekî din. Bi rastî ez şâş mam, hêviya min şikest.

Di roja 3'yê Çiriya Paşin de yek ji ronakbîren Kurde li Lenîngradê (naxwazim navê wî li vir bidim) hat otelê ji bo ziyareta me. Em li kafeteryayê rûniştin û me dest bi sohbetê kir. Sohbeta me bi tevayî li ser yekîtiya rew-senbû û akademîken Kurd ên hem li Sovyetê û hem jî li warênu û. Bi li ser vê yekê tu dijîti dîrnek. Lî pişti hewqas gotin, ronakbîre me qala çêkirina alfabe-yek nû ya Kurdi kir û got;

"Berî çendekî ez li Moskovayê bûm. Min li wir alfabe-yek nû çêkir û kir qanûn û ez hatim". Na-veroka sohbeta me li ser "yekîti" û "hevkar" yê bû. Heya dawiyê ji ew di vî warî de li gel me bû. Lî pişti gotina wî ya "çêkirina alfabe-yek û qanûnkirina wê" tu qîmeta sohbetê nemabû.



Li Tbilisê sinifa Kurdi (Foto Armanc)

## Me li Gurcistanê ci dît

Di roja 6'ê Çiriya Paşin a 1990'ı de em çûn payîtexta Gurcistanê, Tiflisê. Reşo Zilan berî ku em biçin Sovyetê Redaktorê Riya Teze Temûrê Xelîl li ser hatina me ya Yekîtiya Sovyetê agahdar kiribû û jê tika kiribû ku hin kesen li Tiflisê agehdar bike da ku em wek mamosteyen Kurd bigihîjin armancen xwe. Armanca herî mezin ew bû ku em dibistanen ku lê dersen zimanê zikmakî tê dayîn ziyaret bikin û dersen Kurdi guhda-rin bikin. Daxwaz ew bû ku em Radyoya Kurdi, Tiyatroya Kurdi, Komela Ronahî û Hunermendênu Kurda ziyaret bikin.

Dema em hatin Tiflisê tu hazîri nehatibû kirin. Her yekî tiştek digot û yekî yê din gunehkar dîkir. Dawiya dawî me fêm kir ku em bûne qurbana dijîtiyên şexsî.

Berpirsiyare pedagojik ê zimanê Kurdi Ezîzê İsko ye. Li Tiflisê di 9 dibistanan de dersen Kurdi dihat dayîn. Lî ji ber ku em pêşî bi Ezîzê İsko re nepeyi-vîbûn (ji me tu kesî wî nas nedîkir û nizanibû ku ew berpir-syarê pedagojik e.) û me wî agahdar nekiribû, aciz bûbû. Bi israr û lavan musada ziyaretkirina dibistaneke (!) ji me re derket. Herçiqas mamosta hebû ku dixwest em herin dersa wê guhda-rin bikin jî musade(!) ji ciyê bilind (!) derneket.

Ku ez bêjîm dersa Kurdi -wek dersa zimanê zikmakî- bi perestroykayê dest pê kiriye qet şâş nemîn! Belê hezar û sed hezar mixabin ku min di jiyanâ xwe ya siyasi de 22 salan bawerî ji bişâftina (helkirina) pîrsa netewî li Yekîtiya Sovyetê anî. Eger dewletek sosyalist rî nede pêşde-birina çanda netewan û di vî babeti de alîkariya neteweyen paşdemayî neyê kirin mirov nikare wê dewletê bi sosyalistî binavîne.

## Di dersxanek Kurdi de

Dersa Kurdi pişti nîvro yan jî êvarê tê dayînê. Mesrefa çûyîn û hatina zarokan, materyalîn wan ji alî dê û bavan tê kirin. Dewlet tenê heqê mamostan dide. Li vir

min divê bala dê û bavên Kurdi û Ewrûpayê bikşinim. Li Tiflisê dê û bavên Kurda zaroken xwe ji deveren dûr tûnîn dibistanen û heya dawiya dersa Kurdi li hêviya zarokan dimînin. Dersa Kurdi di heftê de carek e. Kitêbên ku tên bikaranen bi tipen Kirîli ne. Lî daxwaz hebû ku dersdayîn bi tipen Latînî be. Mamosta hebû ku dersa Kurdi bi tipen Latînî dida. Lî wê jî gazin ji tunebûna kitêb û materyalîn din dîkir û hêviya alîkariya ji Kurde li Ewrûpa dîkir. Min bi xwe soz dayê ku ji wan re kitêbên bi tipen Latînî bi rî bikim. Eger mamosteyen Kurdi di vî warî de alîkariya min bikin ezê pîr kîfîxwîs bibim.

Di dema dersdayîna Kurdi de tiştekî ku pîr bala min kişand tew-rênen mamosta bi xwe bû. Çavê mamosta tim li Ezîzê İsko bû û E. İsko bi rehetî dikaribû direktif bide mamosta. Xuya bû ku mamosta di dersa xwe de ne azad bû. Ezîzê İsko bi rehetî dikaribû mudaxele bike. Min sebeba vê yekê jî tu kesî nepirsi. Ji ber ku sîstema İdarî ya Yekîtiya Sovyetê bi direktifîn ji jor kar û barê xwe 70 sal domandîye. Dîrektilen ku Ezîzê İsko didan mamosta, mîrasen sîstema 70 salî bûn.

## Di dawetên Kurdan de

Li Tiflisê em du caran çûn dawetê. Li gor ku ji me re hat gotin, Kurde li Tiflisê havînan dawetên xwe di meydanan de çedîkin û dengê dahol û zîrnê yan jî tembûr û defê heya derengê şevê li hawîrdorê bela dibe û tu kes jî gazinan nake. Herçiqas dihat gotin û me jî bi çavê xwe didit ku tunebûne hebû jî di dawetên Kurda de xwarin û vexwarin heya tu bêjî hebûn. Kurdan ji Kurdbûna xwe tu tişt winda nekirine. Tiştê ku di van dawetan de pîr bala min kişand ew bû ku yekî dawetê idare dîkir. Ji vî kesî re "temada" (gotineke Rûsiye û di mana rîvekir, serok tê bikaranîn) dihat gotin û ev kes mikrofon di destê xwe de bê westan pesnê Kurdbûn, urf û edetên Kurda dida, nesîhetan dida keç û xorîn Kurda. Di dawetekê de jin û mîr tevlîhev bûn lê di ya din de jin û mîr jî hev cûda bûn.

## "Em ne Kurd in, em Şemsî ne(!!)

Di daweta ku jin û mîr tevdê bûn tiştekî pîr enteresan hat serê min. Dema em hatin ciyê dawetê (her du dawet jî di konan de hatibûn li darxistinê) yekî bi bej-na xwe dirêj û qelew hat pêşîya me. Serokê Komela Ronahî Nurîyê Şamil Ankosî jî bi me re bû. Kurde bejindirêj û qelew xêrhatin da me û pîr kir:

-Hun jî ku ne?

Min got:

-Em ji Kurdistanê ne û Kurd in.

Wî awiran li min da û got.

-Kurd! Ev ci mîlet e? Zimanê we ciye? Bi rastî ez gelek şâş mam. Ji ber ku min qet texmîn nedîkir ku wê pîrsen wiha di nav Kurdan de derkevin. Lî cardin min bersiv da û got:

-Wek min got, em Kurd in, niha li Swêdê dimînin û zimanê me jî Kurdi ye. Ne vaye tu jî vî zimanî dipeyi-vî.

Wî çavê xwe li ser min bel kir û bi hêrs got:

-Na, na, ez ne Kurd im û zimanê min jî ne Kurdi ye. Ez şemsî me û zimanê min Ezzîkî ye.

Nûriyê Şamil Ankosî milê min girt û em çûn ciyê ku şanî me dan rûniştin. Pîrsen vî Kurdi ez gelek êşandibûm. Min berê jî bihîstibû ku di nav Kurdan de dijîtiyek wiha heye lê min qet texmîn nedîkir ku ezê şahidê vê yekê bibim. Li vir min divê hin tiştên ku ji min re hatin gotin pêşkêşî xwendevana bikim. Me-sele li ser Kurde li Ermenîstanê ye. Partizanen Ermenî berê xwe didin gundênu Kurda (Li Ermenîstanê hem Kurde misilman hem jî yê Ezzîkî hene). Partizan ku êris didin ser gundênu Kurdan û malen wan talan dîkin, heywanen wan dîbin, Ezzîkî raste rast ji Ermenîstan re dibêjin: "Heyra em ne Kurd in, em Ezzîkî ne. A vaye yê misilman û Kurde ev in. Wan bukujin, çîma hûn me dikujin?" Helbet masmedya Ermenîstanê jî propoganda vê yekê dike. Şêx Ezzîkî derdixin televizyonê û bi wan didin gotin ku Ezzîkî ne, ne Kurde in.

# Çirok

## derdimandina jina rewşenbireki

### Zînê

Çavên wê tiji hêstir bûn û gotin ji gewriyê bi zorê derdiketin. Gote min: "Xwezi min yekî Tirk, Ereb, Ecem kiribûya û min evê Kurd nekiribûya!" Ez mat mam. Di çavên min fikirî û kese-reka kûr kişand û çiroka xwe berdewam kir:

"Loman ji min meke û mebejê ci bi serê vê hatiye? Ez baş dizanım ku bêçiyên destâ hemûne weke hev in, lê ya min ditiye û ez dibînim kûçikê serê serguya ji nebinin. Neh salên me ne ku em bi hev re zewcî ne, me bi dilê xwe jî hevdû kir. Ji Kurdiyê û ji yekbûna doza me pê ve kesekî tu zor neanî ser min. Niha, ew xwe rewşenbir û berpirsiyar dibine û barê Kurdistanâ zeftkiri hildaye ser milên xwe, lê bi kîmanî her ji deh panzde rojan carekê destek kutek digine min. Çavên wî birjin, di mista min kevin, ew Kurdistanê

zeftkiri dibine û zeftkeran zordar dibine û xwe jî serok û berpirsiyar dibine! Baweriya wî ew e ku: Jin jin e û mîr mîr e! Ev bû heft salên me ne ku em li Ewrupa ne, mesfî min û daketina bajêr bi tenê tune ye, ji xwe re şermeka mezîn dibine ku têkeve metbexê, pişta xwe dide qarolê û qedehe xwe ya vala li pêş mîvanan jî û bi pozekî bilind bêyi ku hema xwe biliwîne dirêji min dike û dibêje: DAGIRE! Heya ku ez nesax bim ji curnê feraqşushtinê bi rojan tiji dimine û hema destê xwe jî navêjê, ji ber ku ji xwe re şerm dibine ku mîrek li ber curnê feraqşushtinê bisekine û feraqan bişo. Hema qedehe avê ji nade dest min! Serê sibê ji mal derdikeve û dema şîvî vedigere malê, ji min di-xwaze dema ku xirtinî bi kilita deri ket ez li pişt deri amede bim û çakete wî jê

bigrim û, pê re, zû divê ez berê xwe bidim metbexê şîva wî hazır li ser masê dînim, çayeka germ ji pêginim!

Ew maf dide xwe ku bipirse ka di nava rojê de ci li mal çebû ci çê nebû, lê hema mafê min nîne ku ez bizanibim wî ci dikir, ci ne dikir. Pir caran ji bi serê zimên bi çend gotinên kurt bersîva min dide û yan berê xwe dide tilfizyonê û çaya xwe vedixwe, yan ji kovareke faşistên Tirkan, ne yeka Kurdi, dike dest xwe. Divê ez xwe bigrim li hember vê rewşê. Eger ez bêjim "lam û cîm" wê bibe şer û bi destek kote kuta bibe. Ci ye? Go: rewşenbir e, berpirsiyarê rewşenbiran e! Vi mîrî mala min li pêş çavê min reş kiriye û dunya li serê min kiriye tara bêjingê! Ez pir dixwazim ji vê jiyanê xelas bibim, lê hema kurrê min ê tek hustiyê min

badaye. Li Ewrupa, her kes li xem û qisawetên xwe ye, kes ne vala ye guhê xwe bide derd û kulên dinê, komelén jinêne me jî weki komelén jinêne xelkê ji tune ne ku em derd û kulên xwe ji hev re rîz kin û çareser bikin! Lî bi nezaniya xwe eme hîn ji hev re bikin çirok û mîdi hev kin û wisa şevbîrêkên xwe pê derbas kin.

Ez çûme welêt, diya min pirejinek e, min nexwest ez derd û kulên xwe ji wê re bikim weqîya ser litirê, xûşk û birayê min her kes bi mal û jin û zarokên xwe de ketine, yanî serê kesî ji kesî re ne yî vala ye. Min pir kulên xwena dan ser hev û da berhev û min ne da der, min got bila ez ji jinbiran xism û cîranan re ne bim çirok, é dile xwe xwes bike kî ye, é bêje heyf li caniya wê kî ye, é bêje "keçê binêre, tevi ku li Ewrupa ne, hele biblihise Xwendê zane mîrê wê çav berdaye keçikêni Ewrupi", a dinê wê bêje "Na keçê, binê ci wê heye"! Kela min pir radibû û min bi zor xwe digit ku ez nedim der. Ji kerba bîra bavê re, kurê min destê diya min gez kir, eyar di nav diranên xwe de gihande hev, li zarokên xûşk û birayê min dixist, porê xûşka min ya canik li destê xwe daland.

Rewşa me ya aborî roj bi roj şünde diçû, malxoyê min xeber li pê xeberê û bi bergeran ji min re dişand ku ew nikare bêyî me bîmine. Ev tiş hemû li serê min bûne kom û ez nesax ketim.

Tuxtor gote min: "tişteki te tune. Nêxweşîya te nefsi ye û eseb e. Divê tu xwe aciz neki? Dema bêna te teng bibe, du heban ji van vexwe û di hundur de memîne, derkeve ber bê hineki bimeşe bila bêhna te fireh bibe û xwe bi tiştin din ve mijûl bike...". Xûşka min a canik di malê de şet û mat ma ji gotinên tuxtor û bi mesela min agehdar bû. Dilê wê pir bi kurrê min dişewti, ku çawa ew zarokê weke feriştan berebere dibe hovek. Şîretên xûşka min, rewşa kurrê min û berger û sozên malxoyê min hîştin ku ez pişti çar-pênc mehan careka dinê li ZiNDANA XWE vegekim! Niha va tu dibîni, em bi hev re ne, şer û dewiyen me berdewam in, sê meh in li min nexistiye, hema tişta dişkine û ez jî heba vedixwim, derketina bi tenê ji bo min qedexe kiriye, kurrê me ji ji ber şerên me bi xwe de dimize. Kurr dibêje bavê xwe: "ger ez jî dema mezîn bibim û bîzewicim, ezê li jina xwe xînim û roja dinê baqek gul jê re bînim!"

Engels dibêje: tu xêr di wê civakê de nîne, ger nîvî wê kolê metbexê be. Tê gotin: dê dibistane, ger te ew dibistane baş damezrand, te nîşkî baş gîhand.

Napolyon dibêje: dayik bi destê rastê dergûşê dihejîne, û bi destê cepê dînyayê dihejîne.

Tê gotin: Jin nîvî civakê ye, û timardara nîvî dinê ye.

### Pêşgotin

Di meha 11'an de û pişti salekê û sê mehan rî bi dest me ket ku em çend rojîn giranbuha bi çanda Kurdi re bijîn. Ca ji wê jiyanê an-wê carê- ji çûna Stockholmê me ci fêde kir?

-I-

Gelo zimanê Kurdi -zarava Kurmançî di çarçewa qonaxa dîrokî de wê bikaribe xwe ji rewşa "çalepka" rawestîne ser piyan? Belê. Ü nîşandanen vê baweriya me ji cidiyet û dilsoziya rewşenbiran hatiye. Gava ku kirin têkeve şûna gotinê û bikaranîn têkeve şûna teoriyê û realistî şûna xewnê bigire, wê gavê sedî sed rewşa dînamîkî perrîn xwe bi ser her tişti re vedigre. Ma cîma gava ku hevalê Remzî bi Kurmançî dipeyive, wê baweriya meriv bi xewna ku rojek wê zimanê me bibe zimanê hemû besen afirandinê, neyê?

-II-

Ku vê carê em vegeriyan û aqilê me ji kîsî me bû...

Çend wêneyen şaş li ser çend kesan ji me re hatibûn gotin.

Wek nimûne, ku Zinarê Xamo mirovekî bi paye ye, ji xwe razîye û serhiş e. Lî Zinar ji me re xuya bû, tenik wekî camê, ne tenê husa, em pê dihisîyan ku mirovekî amade ye ji şikestinê re. Miro-

## bi Erebî dinivîsin lê bi Kurdi dişewitin

### Ehmed Huseynî

vê wiyo bê guman herdem bi êşek giştî û kûr mijûl dibe!

Ü M. Uzun-nivîsîn xelkê pişti mirina wan bi navê xwe çap dike. Lî ciwamîr derket mirovekî nîvîskar û edebiyatperst.

-III-

Di tevgera çanda Kurdi de ramânîn cur be cur hene. Li ser ziman û edebiyatê û li ser kovar û rojnamen Kurdi nîrînen cuda dihatin holê. Bê guman, ev bi xwe ji ten-durista tevgerê têt. Yekî û dijîti di platforma hişyariya şaristani de wê dergehê mezîn li ber nûjenki-rina ziman û bêja Kurmançî vekin.

Ü ji bo ku zaravê Kurmançî hîn bi pêş de here, pêwîst e di qonaxa iro de rexne û rexingiran biafirîne. Çiqasî zûtir rexn bêt damezirandin hewqasî wê zûtir ziman bîhîje sînorîn giştî û di dîroka edebiyatê de "Pûşkin" helbestvanê netewa Rûsî û "Bêlînski" yê rexingir, hevçaxê Pûşkin wek mînak li ber çavan e.

Lê belê pêwîst e ku her tişti ji destpêkê de li ser bingehêne zanîstî û mantiq bêne avakirin. Çanda me di vê demê de, ku ne bi rexne be tîna wê nayê şikandin, bi rexne wê du tişten serekî bêne guhertin: forma nîvîsandinê û şîweyê nîvîsandina pêşerojê gerek ji bo nîfşê ku wê bêne em bikaribin zemîna afirandinê firehtir bikin, ta ku mîjî di wê çarçewê de bikaribe bêtür çarmedor bîmije.

Bi kurtî eger berhemên me tevan ne yêne rexinkirin emê her û her xwe di berhemên xwe de vegeerin û di edebiyata me de ni-mûne pirin... Ü divê her nîvîskar bizanibe ku qanûnên edebî berde-wam in û xweser in, berya wî ne û bi wî re ne û wê pişti wî jî bîmînin. Mirov (însan) dikare wan qanûnan nas bike, bi wan hisyar bibe. Lî tu carî nikare wan ji holê rake. Ü divê em di gelek tiştan de mirovîn objektîv bin. Hêrsên xwe, pêjnîn xwe, germ û sariya nava xwe nekin hakimdar û di şûnê de pêwîst e aqil û tecrûbe

hakîmîn herî mezîn bin. Ev pey-vîn han bi taybetî ji bo rexingirîyê têne gotin, lî edebiyata me naeve sewiya dilxwaziya me, eger em nîrînen kevnar, ên êlitî-yê, îdeolojiya zuha û partîya bi koranî, daneynîn alîkî.

Digel ku wan çend rojîn li Stockholmê, hevalên me yêne nîvîskar dianîn bîra me "şevîn me û civatîn me, xaniyê teng û mişt guhda bîranîna Helebçê û kûre-kûra jinêne Kurd li ber pêlîn hel-bestê di xwîna me de hisyar dibûn..."

Lê belê, em vegeriyan bi çenten mişt pirtûk, rojname û pelîn sipîzer û çend bîranîn xwes yêne rewşenbirîn Kurd li Stockholmê, yêne ku di berf û seqemê de çirêñ dilê xwe vêxistine, diponijin û herdem welat mîna bûka berfê xwe di xewnen wan de li ba dike. Xewna vegerê, dîtina welêt û gel û hevpeyvînek bi şewat bi rihana zaroktiyê re.

Em gîhiştin odêñ xwe. Ka emê karibin ci bikin? Ü min telefon ji

Mehmed Effî re vekir û jê pîrsî; em çawa dest pê bikin? Got: de ka em ji H. Bedirxan bi rî kevin. Pişti 10 rojan du rûpel bi zimanê Erebî bi postê ji min re şand. Min herdu rûpel wergerandin û di wê demê de min jî li ser eyîn babetê çend rûpel nîvîsand wergerandi-nê de min tev li nav hev xistin û di dawiyê de ev nîvîsar bi me re derket. Wek gava pêşin bê guman wê hinekî qelsbûn tê de hebe. Lî kesê bêdeng tenê naeve şâşîtiyê. Ji bo ci ev nîvîkarênu ku bi zimanê Erebî dinivîsin hatin hilbijartîn ?"

Şîrko Bêkes dibêje: "Bi Erebî dinivîsin, lê bi Kurdi dişewitin." Ü em jî dibêjin ji ber ku nîvîskarênu Kurd in û emê wan bi Kurdan bidin nas kirin û ji bo ku agir di hinavê wan de gurtir bikin.

Di dawî de sipas ji bo hevalê Seid ku em têrîpel kirin û pêñûsa ku ez pê dinivîsim min ji ser masa wî "diziye". Sipas ji bo Armancê ku emê bikaribin li ser rûpelên wê hinekî ji mirovatiya xwe pêk bînin..."

Ji ber tunebûna ci, me dewama nîvîsî; nasandina H. Bedirxan nik-aribû di vê hejmarê de biweşanda. Ji mecbûrî me hîşt hejmarâ bê. Ji ber vê yekê em ji heval Ehmed Huseynî û ji xwendevanan lêborînê dîxwazin.

**Beyana Sekreterê Giştî ye**

**Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan(PPKK) Serhad Dicle**

## Biryara Tirkiyê ya ji bo rakirina qanûna 2932'yan ne elametê xêrê ye !

Di demek wilo de ku Şerê Xelcî gurr bûye û Tirkîye bi her awayî muhawele dike ku ordiya xwe têxe Kurdistana Iraqê, Konseya Ewleyî ya Milî zûzûka civiya û tawsîyeyî Heyeta Wezîran kir ku ji bo rakirina qanûna 2932'yan (a ku zimanê Kurdî qedexe dike) gavan bavêje. Her di wê şevê de Heyeta Wezîran civiya li gel paşdexistina grewa karkiran ji bo du mehan, biryar da ku pêşniyariya rakirina an guhertina qanûna 2932'yan bibe meclisê. Wezîrê Edaletê zendên xwe hilda, muswdeyek qanûnê ku hê naveroka wê ji bo raya giştî nehat eşkerekirin, pêşkêsi serok wezîr kir.

Hema pişti şeva ku Konseya Ewleyî ya Milî û Heyeta Wezîran biryar girtin, ajansên Tirk manşetên li ser mesela rakirina qedexeyen ser zimanê Kurdî ragihandin ajansên dînyayê. Rojnamên Tirk, bi gurre-gurrek mezin iddia kirin ku qedexeyen li ser zimanê Kurdî têrakirin, ji nuha pêve Kurdî wê bi serbestî bê xwendin û nivîsandin, kasetên teyp û videoyan bê derxistin, hetta di televizyonê de ji wê programên Kurdi bêne wê sandin.

Gelo xêr e, di rojek wiha de ev welwele û hela hela? Hê bêyî ku hespa me hebe em dest bi çekirina afiran nekin, divê em rastiyen li pişt vê gurre-gurê, sedemê wê bibînin û zanibin mana esasî ya van gavê han ci ne?

Beri her tişti ji ali têgihîstina niyeten hukumeta Tirk girîng e ku em bibînin ev gav di demek wilo de tê avetiñ. Li Xalîcê şer germ bûye û Tirkîye bi her awayî muhawele dike ku têkeve Kurdistana Iraqê.

Herçî bi serdesti êrisen leşkeri yên tifaqa navnetewî dimeşî ji, işareten ciddî hene ku şer wê ji texmînan ji zêtetir dûr bajo û tâhîfbkar be. Herçîqas Iraq di navbera du heftan de bû hedefa êrisê hewayî yên herî mezîn ên tarixê ji, berpirsiyaren leşkeri yên tifaqê, diyar dikin ku Iraq ji sedî şest û pêncê hêza xwe ya leşkeri hê de dest de dihêle. Ji rampeyên seyyar fuze(sewarîx) ber bi Isarîlê, Erebîstana Suûdi û welaletin Xelcîde de difirin. Petrolên Kuveytî bi firehî diherikin nav ava Xelcî. Iraq xwedî çekên kîmyayî û bîyolojîk e. Seddam iddiâ dike ku îmkana bikaranîna çekên kîmyayî di destê wan de heye û wê wan bi kar bînin. Ma ev gef hemû fort in? Kes ji sedî sed nikare bêje (erê). Bileks herkes di wê baweriyê de ye ku her tişti ji Seddam tê.

Di destpêk de ji bo pêknehatina valayîya hukumetkê ku wê karibuya tevlihevî û kaosekê li Iraqê peyda bikira, êrisen leşkeri yên li ser Iraqê şexsê Seddam ji bo xwe nekiribûn hedef. Lî ku dijwarî, rîsk û xeteren mezin eşkere bûn çend roj in koalisyonâ navnetewî û bi kêmasi Amerika dixuyê ku razîye bi suikast yan inqilabeke hundurî yan ji bi êriske ji dervayî şexsê Seddam ji holê bê rakirin. Gava ev bi ser keve, iñfîmalek xurt e ku li Iraqê kaos û tevliheviyek peyda bibe.

Di rewşek wiha de ne dûr e ku Iran û Sûriye têkevin nav erden Iraqê ji xwe hê ji destpêk de ye

ku Tirkîye dixwaze têkeve Iraqê an niyeten Iraq û Sûriyê pêk bêne hin ji wan dewleteren ku li ser ketina Tirkiyê ya Iraqê dil nedikirin ji; yên wek Amerikayê, İngiltere, him dewleten Ereb yên mutefikên koalisyonê û hwd. ji razî bibin ku Tirkîye ji têkeve Iraqê, heta karin vê yekê teşwîk ji bikin.

Nexwe rewş wiha ye ku, her gav kare pêwîstiya ketina Tirkiyê ya nav Iraqê peyde bibe. Di dagirkirinek wiha de, ji bo ku Tirkîye rastî dijwariyan neyê yan wan kêm bike, hê ji niha ve imkanan hazir dike.

Tedbirênu ku herî pêşin têfikirin ew in ku sempatî û piştigiriya Kurdên Tirkiyê bê qezencikirin, rastî li berxwedana Kurdên Kurdistana Iraqê nebin hetta ew bêne kişandin ba wan. Tirkîye bi biryara rakirina qanûna 2932'yan dixwaze vê yekê bi ser xe. Jê pêştir bi rakirina vê qanûnê Tirkîye dixwaze raya giştî ya hundur û derve bi derewa xwe ya ku dibêje Kurdên Tirkiyê ji wek Tirkan di cumhuriyeta Tirkiyê de bûne xwedî şexsiyet û mafen xwe yên milî, bixapîne.

Eger ev derew ciyê xwe bigre, wê bibe palpişta iddiayen Cumhuriyeta Tirkiyê ya ku xwedêgravî ji Kurd û Tirkan pêk tê, ku heqê wê ya tarixî li ser Mûsil, Kerkükê û hemû Kurdistana Iraqê heye ya ku piraniya nufusa wê Kurd û Tirk in. Li gor Tirkiyê rewşek weha wê meşruiyetê bide ku Tirkîye erde Kurdistana Iraqê ilhaqî xwe bike. Pişti şer bi van kartan wê Tirkîye karibe li ser masê rûnê, heger karibe wê perçekî Iraqê jê vejetîne û nikaribe ji wê rê li ber Kurdan bigre ku dewletek federal yan otonomiye berfireh deynin û paşê vekiye.

Ji bo ku armanca rastîn ya biryara rakirina qedexa li ser zimanê Kurdî ev e û ne ew e ku bi rastî ji zimanê Kurdî bi her awayî serbest bibe, divê em balê bikşînîn ser tehlîkeyek din ji. Tirkîye kare xwe bi wî awayî nîşan bide ku xwedêgravî wê qanûna 2932'yan rake, lê bi derengxistina biryare di Heyeta Wezîran de, di komîsyonê meclisê de di qonaxa şer de wilo bihêle û paşê dernexe ji. Divê ev leyistik bê pûçkîrin. Herçî tu maneyek girîng a rabûna vê qanûnê tune be ji, tevî her tişti ji bo ku wê rê li ber hin fîrsendîn piçûk veke divê muhawele di hundur û dervayî parlementoyê de bêkirin ku ev qanûn zûtir rabe, divê em li hember biderengxistina wê hişyar bin. Ya duduyan divê em rînedin ku rakirina vê qanûnê bibe bahane ji bo meşrûiyeta dagirkirina Kurdistana Iraqê. Li hundur û dervayî welat divê em bi xurtî li dij rawestin ku Tirkîye ordiya xwe têxe Kurdistana Iraqê.

Bi van hemû karan re ji divê em nîşanî raya giştî a hundur û derva bidin ka gelo maneya rastîn a rabûna vê qanûnê ciye, vê fîlbaziya Tirkiyê eşkere bikin û nehêlin ku ruyê xwe yê reş spî bike. Eşkere ye ku mesela Kurdî ne bes mesela serbestbûna zimanê Kurdî ye, mesela tayinkirina qedera miletekî bi dest xwe ye, hukumraniya wî ya li ser erdê xwe, bidestxistina jiyanek serbixwe û

azad a miletekî ye. Helbet di riya hela dawîn a vê meselê de, serbestbûna zimanê Kurdî ne gavek bêqîmet e, girîng e û her Kurd wê xwedî li gavek wiha derkeve. Lî ev gava ku hukumeta Tirk bi rakirina qanûna 2932'yan davêje, geleki ji serbestkirina Kurdî dûr e û bes di vî warî de ji xapandinek e.

Rakirina qanûna 2932'yan, Kurdî li hember qanûnan hîn nayne dema berî inqîlaba 12'ê Ilona 1980'yi ji. Pişti inqîlaba 12'ê Ilonê gavê ji bo qedexekirina zimanê Kurdî hatin avetiñ bes bi derxistina qanûna 2932'yan neman. Di qanûna çapemeniyê de(pressê, basinê de) di qanûna avakirina partiyen siyasi de, di ya avakirina komelan de, di ya derheqê meş û mitîng û civînan de, di qanûn û maden qanûna esasî yên di derbaryî resmî qebûlkirina zimanê Tirkî de, gelek hukmîn eşkere heñe ku xwendin û nivîsandina Kurdî qedexekirina. Di qanûnen avakirina parti û komelan de tê xwiyakîrin ku parti û komele ji bilî zimanê Tirkî bi tu zimanî nikarin belavokan derxin, beyanan bidin, şîaran binivîsin, civîn û demostrasyonan bikin. Di meş û mitîng û civînan de ji bilî zimanê Tirkî bi tu zimanî divê neyê axaf-tin, pankart, afiş û slogan neyîn nivîsin. Li gor qanûna çapemeni-yê, çapemeni azad e, ne tabîi iznê ye. Lî ji bo çapkirina bi zimanekîne Tirkî divê izin bê stendin. Ga-va qanûna 2932'yan hebe ji bo çapkirina kitêb, rojname yan kovareke bi Kurdî izin ji tunebû, qedexe bû. Lî ev qanûn ku rabe ji bo çapemeniya Kurdî rasterast serbestî peyda nabe, wê girêdayî be izna meqâmén berpîsiyar be.

Jê pêştir maddîn qanûna esasî û qanûnen ku resmiyeta zimanê Tirkî mecbûr dîkin, di nivîsandin û pêwendiyen resmî de, di daîren dewleterê û meqaman de, di dezge-hen hîndekariyê (dibistan) de Tirkî ferz dîkin û Kurdî qedexekirina. Ger qanûna 2932'yan rabe ji li van deran serbestî ji bo zimanê Kurdî nayê, mecbûr divê herkes xwe hînî Tirkî bike û bi Tirkî bixwîne, biniwîse û biaxive.

Hemû ev hukmîn ku li maden cihê yên qanûna esasî û li qanûnen cihê hatine belavkirin gava

meriv bîne berhev, dixuye ku qanûna 2932'yan rabe ji serbestî ji bo Kurdî bes di afaştînê de, ew ji li malê û li kuçê tê. Di hemû wa-ren din de qedexeyiya ser zimanê

Kurdî dom dike. Gava ev qanûn hebû ji di fîliyatê de kesî nikaribû li mal û li kuçê Kurdî qedexekirina. Nexwe bi rabûna vê qanûnê di fîliyatê de tu berfirehî ji bo serbestbûna warêne bikaranîna

Kurdî nayê. Tişte ku dibe li ber çavê raya giştî ya hundur û ya cihanê bi niyeten xwe pakkirina hukumeta Tirk dibe, bi muhawelêne wê dibe û bi xweziyê wê yên li ser dagirkirina Kurdistana Iraqê dibe.

Pûçkîrin van niyet, muhawele û xweziyê qirêt wezîfe ye li ser her Kurdeki welatperwer û her Tirkîku dibe ez demokrat im.

29. 01. 1991

## Hindik-Rindik

### Derewa di malê de

Gur ji serê rojan ve bû ku hîn li ser zenga diranan bû. Ji birçina qure-qura zikê wî bû. Westîyayı, bi haleki xerab xwe ji ciyê bera jér da, çû pala xwe da zinareki û di ber da got:

Yarebi, ma ev ji jiyan e? Hemî ruhê min bistîne û min ji vi hali xelas ke çetir e.

Tam di wê bistikê de nêçîrvanekî di jor wî re gava ji ser kevireki xwe çindi ser kevireki din kir gomaki tu dibê ecüb ji bin nigê wî gundori jér bû. hat li ber nigê gur ket. Li ser vê, gur berê xwe qiyame kir û got:

- Malava, ma edî meriv nikare li mala xwe ji xwe re derewekê ji bike... te hema tavile ev goma berra ser serê min seqiri da...

### Ez ji gundê Swêregê me

Yeki Swêregi li Wêransarê çû ser berber. Berber meriveki henekî bû, dizanibû Swêregi hineki zû sor dîbin. Lema ji bi armanca ku deng here yê Swêregi, ji müsteriyê ku riya wî kur dikir re got:

- Beri te bi bisteke yeki Swêregi hat min riya wî kur kir. Gava min şırce sabûn kir ku riya wî sabûn bîkîm, nehiş, got:

- Hoste, eybe, ez ne ew mîre ku riya xwe sabûn bîkîm... U min riya wî bê sabûn kur kir.

Dor hat yê Swêregi. Gava berber xwest riya wî sabûn bike, bi destê berber girt, got:

- Hoste, riya min sabûn meke, ez Swêregi me.

Berber pê ket, bêyi sabûn dest bi kurkirina riya wî kir. Ji bextê wi yê xerab re çîma riya wî ji pîr ne gur bû, hewqas gur bû ku güzen nikaribû pê. Xwin bi ser wec ket, her cara ku berber güzân davete, çîrkîni ji diranan dihat, ji eşê xwe diqurmîçand ser hev. Gava berber xwest dest bi kurkirina alîye din ji bike bi destê berber girt, got:

- Hoste, ez ji gundê Swêregê me, ne ji nav bajîr im. Tu ji kerema xwe re vî alîye riya min sabûn bike.

Amadekar: Z. Xamo

## Hukumeta Tirk biryara rakirina Qanûna 2932'yan da

Şeva navbera 24-25'ê meha Çileya Paşin Konseya Ewleyî ya Tirkîye civiya û biryara tawsîya rakirina qanûna 2932'yan (a ku xwendin, nivîsandin û axaftina Kurdî di her warî de qedexekirina) da heyeta wezîran. Her di wê şevê de heyeta wezîran civiya û biryara da ku tekliha rakirina qanûna 2932'yan bi qanûnekê bibe

meclisê. Li gor tekliha ku hatiye meclisê, axaftina Kurdî wê li malê û li kuçê serbest be, stranen Kurdî wê di kaseten teyp û

videoyan de serbest bin.

Wekî din, çapkirin û weşandina rojname û kitêbên Kurdî, di daire, mehkeme, medrese û hemû dezge û warên resmî de axaftina bi Kurdî wê qedexekirina.

Ev gava han di nav Kurdan de get nebû ciyê kîfxweşî û şahiyê. Kurd dibêjin ku gava Kurdî di hemû waran de qedexekirina. Di teklîf bike ku qanûnekê dîne bi teklîf bike ku têkeve şûna vê qanûnê, da ku valayî di warê bikaranîna xwendin û nivîsandina Kurdî de peyda nebe.

Wezîrê Edaletê tekliha qanûnekê hazir kir û da heyeta wezîran û heyeta wezîran û gava hukumetê û siyaseta wê ya şerî Xelîca Faris bi hev ve girêdayî ye.

### PEN'ê rexne li Tirkîye girt

Klüba Navnetewî ya Nivîskaran (PEN) rêxistina Almanya di beyanek xwe deda diyarkirin ku Tirkîye riayeti mafen insanî nakek û bi taybeti li hember Kurdan siyaseteke nemirovî dimesine. Ji ber van kirinan ji PEN'ê di beyana xwe de Tirkîye bi zimanekî sert rexne dike.

Di beyanê de bang li Serokkomar Turgut Ozal tê kirin û tê gotin ku zulm û zora li Kurdan dibe hîn berdewam e. Wek numûne, li gel biryara rakirina qanûna 2932'an hîn ji nivîsandina bi Kurdi, weşandina eserên edebî û kulturi yasax e. Di beyana PEN'ê de tê gotin ku Tirkîye bi biryara rakirina qanûna 2932'an dixwaze bala raya giştî ji ser kirinên xwe yên li dijî mafen insanî dûr bixîne û bîkîne alîyekî din.

## DİYARBEKİR Dİ SERNEWE Û TESİRÊ CENGÊ KUWEYTÎ

Hesenî GİRAN

Eyro (Ewro) "hesabê ma" (teqwîmê ma) yê verenî gore hîrê yê Çellî yo, hesabê mîladi reydi zî 13. 1. 1991 o. Hesabê ma gore emşo sernewe wo.

Hima serê sibay o, teber a tînc a. Eyam hindî weş o ki kê vanî qey wesar o. Rojan ra rojî kirê yo. Ez 'enê eyro nêvejiyaynî teber, hewna tebat mi nêkewt, ez şîya teber. Inî rojan di kê kura şonî qal qala cengî ya. Heme hetî ra vay cengî yeno. Ez meraq kena, 'eceba şarê ma, mîleta ma ci duşmîşiyêna, se kena?

Ez Kuru Çeşme (Eyniwo Peysaye) di minibisi ra peye biya. Ez 'enê raşt viyartnî şîni, qırnî Kuru Çeşmî di yew dikan mi çim a kewt. Teberê dikanî di tanî naylonî û sungerî leqnâyey bî. Dikan sexlet bi, şarî sunger, naylon û bant erînaynî. Mi zî kerd ki şera vayîya inî çiyan persa labrê ez nêşîya, mi va "Gama ki ez şan di ageyraya ez ko persa û bierîna." Şarî inî rojan di zav çîyê inasarênî erînaynî ki pey qul û şeqalanê pacan û beranê xwi bigîri. Şarî vatnî Seddam kîmyewî (yan zî gaza ja'rêni) fineno ma ser, ma xwi rî tedbîrê xwi bigîri, beno ki ma merg ra bixelisi.

Ez ver bi Doryolê Baxleran (Çarrraya Rezan) şîya. Kişa çepi di mi tretuwari (qaldırımı) ser o yew esnafo şinasî dî. Ino esnaf kam gama ki mi veyneno peşmiriyêno (peşminîno), ez zî peşmiriyêna. Eyro zî senê ki ez dîya peşmiriya, ez zî peşmiriyaya û heta jey ra şîya. Ma destê yewbînan tebiş, pêt şidêna û ma pê persay. Kursi da mi ez rûnişa. Qali, qali, mesela cengî abî. Va:

-Diyarbekir di ci kes nêmeno, pêro remay, Diyarbekir terk kerdâ. Ayo ki ciwan bo û biremo gonî te de çina.

Ma gamî teriqna, be'dî ez weriştâ ray menda şîya. Ez Doryolê Baxleran zî resaya, rayîran di sexlet çinibi. Rayiro ki ver bi Seyrantepe şono, ez ay rayîr di tikê şîya û şîya zerrey yew qehwî. Ez qehwe ra ewniyaya mi va "Hela veynî qe yew şinasî çîno", yewdo şinasî çinibi. Rojanê kirêyanê bînan inî qehwî di ca çinibi ki mîrdim roşo, eyro zî tena çend hebî mişterî yew dêse jey heti roniştebi. Ez çind deqey qehwe di rûnişa, dim a vejiyaya teber. Senê ki ez vejiyaya teber, ez raştê yew dewijê ma ameya. Zafê dewijanê ma yê ki Diyarbekir di yi, xwi ra ewta Baxleran di roşenî. Ez û dewijê ma ma pê persay, mi va:

-To xeyr o ti ewta dêsi ver di vinderti?

Key xwi mi nawit, va: -Ez ewta roşena, ino key min o.

Ma bineyna qalî kerdî, va:

-Dewijanê ma ra ci kes Diyarbekir di nêmendo. Hima

hima ki herme şî dewi.

Ez jey ra zî aqityaya, rayîr bê xwi ra şîya. Rayîr ra ez duşmîşiyaya, mi vîr kewt ki vizêr gazeteyan di nuştebi ki "Diyarbakırılar Diyarbakırı Terk Ediyorlar" (Diyarbekirji Diyarbekir terk kenî). Ina xeberi raştî bî. Diyarbekirji hîris (vîst û des) hebî otobusan reydi şîbi Es-tembul. Eyro zî mi bi gûşanê xwi eşnawitîni ki Diyarbekir veng bîya.

Ez inawa duşmîşiyayîşî reydi şîya dikanê yew şinasî. Wayîrê dikanî tikê mîrdimê ma zî hesibiyêno. Ma pê persay û verojikê dêse dikanê jey di kursiyan ser o ronişti. Ay hing di dina hebî dewijê ma amey ma ser ro ginay. Hemînî qalê Cengê Kuweytî kerdî. Wayîrê dikanî va:

-Mi gedanê xwi ra va "Bêri ez şîma rî yew dolmîşî bitebişâ, şîrî dewi."

Dewijanê ma ra yewî va: -Cay ma çino ma xwi rî rageyî.

Dewijê ma wo bîn zî karker ('emele) bi. Va: -Ey mi yew qula banê mi dewi di esta, ez cenevk û gedan ray kena weyra.

Herkesî derdê xwi va, ma weriştî vila bî. Ez şîya yewna şinasî het. Inî şinasî xwi rî yew kabîni kîra kerdâ, weyra bi peran derzînan dano şarî ro, pansuman keno, karanê inas-rênan keno. Jey va:

-Meqsedê Tîrkiya, Iraç niyo; meqsedê ja PKK ya. Tîrkiya wazena dekiwo cengî mîyan ki peynîya PKK biyaro.

Sîudî rî eyro ez kura ki şona ez raştê dewijanê ma yena. Yew dewijê ma zî inî pansumankarı (pansumançı) heti ronişti bi. Ino yew mirîde Key Şêx 'Evdirêzaqî (Abdürrrezak Ensarioğlu) yo. Ey zî va:

-Şêx Se'îdî (Sait Ensarioğlu) Yalova ra, Bursa ra xeberi erşawita, vato "şîrî dewi". Ma siba şonî dewi.

Ma çind deqey weyra ronişti, se'et hîrê û nêm (yew û nêm) bi, yew cenîya ciwani gedey xwi ard ki wayîrê kabîni derzîni bido piro. Mi zana ki wextê weriştî yo, ez weriştâ û agey-rayaya ameya Doryolê Baxleran. Mişterî dikanê naylonî ver di pêşer bîbî. Herkesî yan sunger yan naylon yan zî him naylon him sunger erînaynî. Ez dikandarî ra bi Kirdasî persaya, mi va:

-Sungerek bi ci ye?

Va: -Abê, heft sed û pêncî!

Dim a vera xwi taday çarşu û qîrra, bi Tîrki va:

-Naylon yedi yüz elli! Naylon yedi yüz elli! Yedi yüz elli!

Ez sungerî ra ewniyaya, dergeya jey yan yew mîtro bî yan çinibi. Mi nêrîna, ez dûrî kewta, şîya Ofis.

Eyro eyam zaf weş o labrê şarê ma bêkeyf o. Ofis yew deme Diyarbekir di mehla en luksi bî. Hewna zî luks o labrê

rexbetê jeyo verên nêmendo. Heway jey duyin o, herimi-yawo. Ez ewniyaya Ofis di zî yew dikan di sunger û naylonî yenî rotîş. Şarî piro kurri kerdâ, pê ser bî. Ez weyra zî persaya, çeher mîtroy jey panc hezarî rotînî. Ez şîya yew lokal. Inî lokalî di tewir tewir gazetey yew masî ser o ronayey bî. Mi gazetey wendî. Gazeteyan zî qalê cengê Kuweytî kerdî. Mi zor da bi gazeteyan ki ez biwana biqedîna, çend şinasî amey masey mi, mi gazetey ca di verday. Ma cengî ser o pê kewtî, ma munaqeşe kerd. Hemînî kritikê Seddamî kerdî. Mi va:

-Şîma raşt vanî, labrê Amerîka zî neheq a, a zî Seddamî ra başêr nîya.

Ma ki munaqeşe kerdînî, masey ma ra yew camêrdî mus'ade waşt, va:

-Ma nezere kay keni.

Cay amey, min û ay bînan ma şimiti. Ina ray mi mus'ade waşt, ez weriştâ mi perey çay day, imbazan ra xatir waşt û vejjîya teber. Ez hewna rayîrê xwi yê verîni ro ageyraya, ameya heta

Dortyolê Baxleran. Ez şîya dikano ki te de naylon û sunger ameynî rotîş ki ez zî naylon û sunger û bant bierîna. Tanî mişterî weyra bî, hetî ra naylon erînaynî hetî ra zî munaqeşe kerdînî. Ti ra yewî bi Kirdasî (Zazakî) wesfê Seddamî day, va:

-La, wilay camêrdo zey Seddamî çîno. Helal bo dey rî!

Ay bînan ra yew-di tenan itîraz kerd, mi zî mudaxele kerd, mi va:

-1988 di Seddamî se kerd ti zanî?

Va: -Se kerd?

Ma va; -Helebce di panc hezarî Kurdi kamî kişî? Seddamî nêkişî?

Mi ki ina va, nêşîya cewab bido, hewna zî riki kerdî, 'eynadey kerdî, va:

-Mi gore Seddam yew lîdero camêrdek o. Semedo ki Amerika ra nêterseno, camêr o.

Ez û o ma pê kewtî, mişterî bîni semedo ki ez nêşinas-naynî mi ra ewniyay, vengê xwi nêkerd. Seki vajî "Ino ci yo, çi kare wo?"

Mi şeş hebî sungerî erînay, perey jînî day; dikandarî perey xwi girotî, mi rî sungerî deker-dî yew torbe, day mi, ez raymenda û şîya keye. Vera vera hewa bediliyêno, teber a yew misqalê zixmê serdî esto.

Ez keye resaya nêresaya lajê mi va:

-Tîkî to ra ver yew qifley koso ame, şî.

Ma va; -Eki hewîna kosey amey, hetana ki kay nêkî û çend tekerlemeyan nêvajî çî medî bere (bi der).

Ma 'ar di şamîya xwi werdi. Ma hima nanî ser o bî, berî ver



di vengê kosan ame. Mi hewna gedey û cenîya xwi tembê kerdî, mi va:

-Gore ba kaykerdiş û tekerlemeyanê jînî çî bidî bere.

Hewawo ki ez zana, ma heti koseyanê Kirdan (Zazan) tekerlemey nêvatînî, semedê aya ra ez tekerlemeyanê ewtay meraq kena.

Kosey to amey, gamî kay kerd, bi Kirdasî va:

Serê salê, binê salê,  
Tişki têxîn tûrê kalê.

Xwedê lawikkî bide vê malê.

Ma say, firtiqalî (pirteqalî) û tanî perey day kosan û ray kerdî, keyfi reydi şî.

Kosey ki şî atêya mi mi rî telefon kerd, va:

-Biray mi, çew (yewek) Suki (Diyarbekir) di nêmendo. Wir kes cayê ra şîyo. Semedê inaway ra nanê dikanê ma eyro nêroşîya, ma ser o mend. Ma zî siba şonî dewi. Eki ti wazeni, ti zî gedanê xwi bigiri, ma reydi bê. Nê zî gedanê xwi ray ki Pîran, tena ma reydi bê. Eki ti nînî mi rî helal biki.

Ez ewniyaya atê raşt-e raşt mi ra helaley wazena, sekî ma hinî mireni û pê nêveynenî. Mi caran inawa ters û telaşê şarê ma nêdîbi. Pîzey mi atêya mi veşa, mi va:

-To rî helal bo labrê metersi, çî nêbeno, mîleti pêro se bî ma zî ko ina bî.

Inî qalan ra pey waya mina bîni amey mi vîrî, mi xwi heti va "A waya mi hîna lezi tersena, kam ci zano a inka se kena?" Mi ja rî telefon kerd, mi va:

-Şîma se kenî?

Va: -Biray mi, şar heme Suki ra remeno, ma nêzanî ma se kî

û ku ra şîrî? Ma nêwazenî şîrî dewi. Ti zanî, atê tena şîna ma bihewêno, key ja zî teng o. Ma inî 'erz û eyalî berî ku ra? Baş a ya ki ma keydê xwi di vindirî, de ki ma merdî, mendî; Hûmay pîl o, se beno wa bibo.

Mi ja ra zî va: -De şîma zanî labrê metersi, ko çî nêbo.

Telefonan ra pey mi xwi heti va "Inî emperyalîstan, inî gonîweran mîleti vista ino hal." Hin bibi ki herkes belî gandê xwi bibi, herkesi tewa gandê xwi girotibî. Ez gedanê xwi ra, cenîya xwi ra ewniyaya ê zî seki bitersi û şîrî pê ser. Mi bala xwi day, kam gama ki key ma di qala cengî bîna, gedey mi gûşan ronanî, gûştarenî. 'Enê bellî nêkenî labrê ez fam kena ki yew ters dekewto pîzedê gedan.

Dim a min û gedanê xwi û cenîya xwi ma qalî kerd, ez ewniyaya ki heme wazeni Diyarbekir ra şîrî. Ma querar da ki ez siba jînî bierşawa qeyme, Pîran. Madem wazeni, wa şîrî çendî rojî key pêran di bî. Mi jînî ra va:

-Ez şîma bîna, labrê ez ageyrena yena Diyarbekir.

Lajê mi zana ki ez raştâ vana, va: -Bawo, qey ti gaza ja'rêni ra nêtersenî?

Ez hiwaya, mi va: -Ez zî gaza ja'rêni ra tersena labrê eki şarê Diyarbekir heme mireno wa ez zî jînî reydi ba, wa estey mi zî estanê jînî reydi pûç bî.

Be'dî mi va: -Metersi lajê mi, inî rojî zî vêrenî.

## Daxuyaniya Civîna Parîsê

1° Gelê Kurd iro di demeke dîrokî re derbas dibe. Bûyerên cihanî, bi taybetî krîza Xelîcê dikarin di Rojhelata Navîn de guherandinê mezin çêbikin. Di vê rewşa dîrokî de, besdarê civinê bawerin ku divê rojekê zûtir kongreyeke netewî ya Kurdistanê bê civandin ji bo diyarkirina stratejiyek müşterek a Kurdî û dirustkirina rîxistineke temsîlî ya hemû gelê Kurd ku bikaribe li ser navê Kurdish bipeyive û wan di teşkilatê navnetewî de temsîl bike.

Ji bo ku ev kongre bi awayekî adil gelê Kurd temsîl bike, divê ku nunerên hemû partî û rîxistinê siyasi, civakî û çandî yên Kurd û ronakbirêne Kurd besdarî vê kongreyê bibin. Lewra em ji hêzên siyasi dixwazin ku rojekê zûtir xebata amedeyiya vê kongrê temam bikin.

Besdarê civinê di wê baweriyê de ne ku bê çareserkirina pirsa 30 milyon Kurd, ên ku weki hemû netewyan mafê diyarkirina çarenusa xwe heye, ewê tucar Rojhelata Navîn negihê aştî û istîkareke domdar. Çareserkirina pirsa Kurdî ewê bibe faktoreke bingehî di bicihbûna demokrasiyê di Rohilata Navîn de.

2° Di vê dema dîrokî de divê hemû hêz, malbend û ronakbirêne Kurd û dostêne Kurd hewl bidin ku pirsa netewayê Kurd têxin

ajenda Neteweyê Yekbûyî û konferansê navneteweyî yên li ser duwaroja Rojhilata Navîn.

3° Beşdarê civinê dixwazin ku di konferansa ku di 27'ê Sibatê de li Senatoya Amerîkayê çêdibe, li konferansa Stokholmê û di her konferansê navneteweyî de, li gel mafêni mirovî her weha behsa mafêni siyasi û neteweyî yên tevahiya gelê Kurd bê kirin.

4° Iro li dervayî welêt nêzî 750.000 Kurd dijin. Komele, malbend, ronakbir û weşanên wan roleke mezin dileyizin di warê nasandina pirsa Kurdî û amadekirina rayeke giştî ya Kurddost de. Lî, mixabin, di navbera wan de hê koordinasyoneke baş nîn e. Iro ji her carê bêtir gelê Kurd hewcê xebata wan û hevkariya wan e. Ji vê bûnê malbend û komeleyên ku di civinê de besdar bûn biryar dan ku di nav xwe de konseyeke koordinasyonê deynin û bi komeleyên Kurd ên ku di civinê de besdar nebûn peywendî deynin. Ewê civîna amedekirina vê konseye de meha adarê de li Stokholmê biceve.

5° Hêz û ronakbirêne Kurd muhtacê diyalog û şêwrîne. Em hêvidar in ku ji bo bersîvdana vê ihtiyacê ewê civinê din ên wek ya Parisê çebibin û bêtir hev têgihîstin, nêzikbûn û tevkariya navbera wan.

## Serê Xelîcê...

Propaganda Seddam pere nekir ku şerê Xelîcê bibe şerê Fileh û Misilmanan, lî firstet ketibû destê hinek hêzên anti-imperialist ku ew li welatê xwe tevgerêne cur be cur çêkin. Li hember hêzên mutefik Seddam ketibû tenagasiyê içar ji bo bala raya giştî bikşîne, kesen sivil (piranî zarok, jîn) di avayıyên leşkeri de bi cih kir. Di 13'ê Sibatê de di bombardimanek Amarîkî de zêdeyî 500 kesen sivil hatin kuştin.

### General û piloten Seddam piranî ji Tikritê ne

Seddam ji kesen qeza xwe ya Tikritê ji xwe re bi navê "Muhafîzen Cumhurî" ordiyek çeki-riye. General û piloten wî hemû jî ji qeza wîne. Li gor pisporêne leşkeri, leşker, pilot û generalên ji Tikritê wê heta dawiyê bi Seddam re bin. Di ordiya Iraqê de bêmoralî gihişîye merheleyek bilind.

### Pilanê Aştiyê yên Gorbaçov

Planê Amerika ne ew e ku tenê leşkerên Iraqê ji Kuveytê derxe her wisa pişî şer dixwaze li gora xwe dûzenek nuh bîne hêremê. Amerika dibêje "ya Seddam bê ordi, yan jî ordiyek bê Seddam." Wexta şer ket vê merhelê Serokkomarê Sovyetê Gorbaçov bi planê aştiyê bala hemû dînyayê kişand Moskovayê. Ü di dawî de 6 nuxtên pilanê Gorbajov ji ali Iraqê ve hat qebûl kirin. Lî Amerika û hêzên mutefik di vê pilanê de tiştekî nuh nedîn û bi razîbûna Iraqê qayîl

nebûn. Nerazîbûnek berfireh di nav Kurdish de li ser pêşniyâren Gorbaçov çêbûye. Kurd gelek aciz in ku çima Gorbaçov muhawele dike ku Seddam û rejîma wî li ser piyan bihêle. Lî hinek dewletan bi sempati li pilanê aştiyê yên Gorbaçov nêrin. Serokê Amerîkayê Bush îltîmatomek da Iraqê da ku di 23'ê Sibatê de Iraq ilan bike ku wê bê şert ji Kuveytê vekiş. Iraqê îltîmatoma Bush qebûl nekir û di 24'ê Sibatê de şerê ser erdê dest pê kir. Şerê ser erdê 100 seat ajot. Nêzî 100 hezar eskerê Iraqê teslimê hêzên mutefik bûn. Iraqê ala teslimbûnê kişand û hemû biryarene YN qebûl kir, bi temamî ordiya xwe jî ji Kuveytê vekişand.

Li gora agahdariyan di şerê Xelîcê de di navbera 85 û 100 hezran leşkerên Iraqê hatine kuştin. Ji hêzên mutefikan; Amerika jî 128 leşkerên xwe di serde wîndâ kir.

### Pirsa Kurd aktüel e

Di Şerê Xelîcê de pirsa Kurdî bi taybeji ji pirsa Kurden Kurdistanâ Iraqê gelek aktüel bû. Heta ber-pîrsiyâren Tirkiyê bi eşkere ilan kirin ku eger li bakurê Iraqê dewletek Kurdish ya serbixe çêbe ewê êrisi wan bikin û musade nekin ku dewletek weha çêbe. Lî bi awakî ne resmî Serokwezîrê Tirkiyê Turgut Ozal dide beyan-kirin ku ew karin razî bibin ku li Iraqê dewletek federal ji Ereb, Kurd û Tirkmenan bê avakirin.

## Întibayê min ên li ser...

### Kurd di bin xeteriyê de ne

Talankirin û kuştina Kurda tirsek mezin dixe nav Kurdan. Ne tenê Kurdêne li gundan lê Kurdêne rewşenbîr jî. Dema nûçeyen kîrînên partîzanen Ermeniya bela dibe, televizyona Moskovayê, bi alimekî Kurd re roportajekê çedike û jê tê pîrsin ka ev iddiayêne ku têne kirin rast in, an na? Alimê me kîrinên partîzanen Ermeniya îñkar dike. Ne tenê ew, lê rewşenbîrêne din jî dengê xwe nakan, çavêne xwe digrin û xwe lal dikin.

Kînyas Mîrzoyev (Turkolog) di mehîn dawî yên sala 1990'î de mala xwe bi dizî bar dike tîne

Qazaxistanê. Wî ji min re qala bûyerek pir enteresan kir. Kurdeki ji Ermenîstanê bi malê xwe ve pirr dewlemend bûye. Du jînên xwe hebûne(!) Partîzânê Ermenî bi darê zorê xaniyê vî Kurdi yê bi 100.000 Rubleyî distînin. Mîrik pezê xwe û zarokên xwe digre û berê xwe dide çiyê. Lî partîzânê Ermenî cardin wî dignin. Pêşî du jînên wî li ber çavêne wî dikujin, perê wî jê distînin. Wî jî idam dikin û pezê wî didin ber xwe û diciñ.

Li gor agahdariya ku min ji Kînyas Mîrzoyev û yên din ku ji Ermenîstanê reviyabûn hatibûn Qazaxîstanê stend, nuha Ermenî iddia dikin ku yên Ermeniya

### Dûmahîk di hejmara bê de

**Ji Şivan Productions**

## 3 Kasetên nuh û xweş !

Adresa Xwestinê

P. O. Box 26008

750 26 Uppsala / SWEDEN

DAYÊ CAN

ME ÇIKIR

Şivan Perwer

GULİSTAN 5

ŞİVAN  
13

Çirokên Newrozê

## HEJAR WEFAT...

gelek lehçe û devokên Kurdi jî zanibû.

Jiyana Mam Hejar her di derbederî û belengaziyiyê de derbasbûye.

Ew di 1946'an de ji ali polisén Şah cara pêşîn li bajarê Saqiz'ê tê girtin û wî diavêjin zîndanê. Piş re dixwazin wî neqlî zîndana Bo-kanê bikin, bi rê de ji nav destê polisan direve, diçe Kurdistana Iraqê nik Şêx Letîf'ê kurê Şêx Mehîmûdê Berzencî. Di dû re bi kimlige (huwîyet) sexte diçe Bexdadê.

Li Bexdadê ji bo ku bikaribe jîyana xwe berdewam bike, li oteylan kar dike, li restoranta fer û folan dişo, paqîjîyê, emeleşîyê (rêncberî) û geleb karêne din dike.

Pişti demekê ji ber zorî û zehmetîya jîyana li xerîbiyê û van kar û barêne zehmet, ew nexwes dikeve. Pişika (cigera sipî) wî iltihab digre. Ji bo tedawiyê diçe Lubnanê, li wê derê du salan li nexweşanê dimîne, pişî ku baş dibe disa vedigere Bexdadê. Lî vê carê ji ber destê polisan nikare li Bexdadê bimîne, direve diçe Kurdistana Sûrîyê li ba mala Ha-co û Celadet û Kamûran Bedirxan dimîne.

Her wê demê ji Sûrîyê diçe Almanyayê. Piş re disa vedigere Sûrîyê.

Di 1958'an de pişî ku li Iraqê 'Ebdulkerîm Qasim tê ser hukim,

ew disa vedigere tê Iraqê li Bexdayê dimîne.

Wê demê Melle Mistefa Berzanî jî ji Sovyetê vegeryaye. Ji ber ku Hejar wî ji dewra Mehabadê nasdike, li gel wî tekili datîne.

Mele Mistefa ji bo ku bikaribe alîkarîya kurdzanen li Sovyetê bike wî dişine Sovyetê. Mam Hejar salekê li Sovyetî dimîne. Li wê derê li ser edebiyat û zimanê kurdi alîkarîya kurdzan û zimannas û edebiyatzañan dike. Her wê demê li Azerbeycanî dîwana wî werdigerîn Tirkîya Azerî û bi navê "Kurt Nağmeleri" çap dikin.

Mam Hejar di destpêka 1960'î de vedigere Iraqê.

Pişî ku di nava Kurdish û hukmata Iraqê de şer dest pê dike, ew jî êdi nikare li Bexdayê bimîne, diçe nav hêzên pêşmergeyan. Mem û Zina Ehmedê Xanî û Şerefnameya Şerefhanê Bedîlisî ji her wê demê li serê çiyan hazır dike.

Mam Hejar heta 1975'an li gel Barzanî ye, lî pişî ku bi peymâna Cezayîrê şer radiweste, weki gelek kurdan ew jî diçe Îranê.

Mam Hejar yek ji hîmdarîn Enstituya Kurdi ya Parisê bû. Wî heta wefata xwe hemû hêz û nûra çavê xwe da xebata edeb û zimanê kurdî.

## SWED

## 45 saliya Komara Mahabadê

Ji bo munasebeta 45 saliya Komara Mahabadê ya Kurdistanê, di 18'ê Çileya Paşin de li Swêdê ji aliyê Partiya Demokrat a Kurdistana û Iranê, TEVGER, Cepha Kurdistana Iraqê, Partiya Rizgariya Kurdistan (Rizgari) û Partiya Pêşverûya Kurd li Sûriyê

Şevez hat amadekirin.

Piştî axaftina li ser Komara Mahabadê ku bi Swêdî û Kurdi çebû, di şevê de şîir hat xwendin û slayt hat nişandan. Şivan, Nasir Rezazî, Ciwan û Ferhad Baban bi dengen xwe yên xwes reng dan şevê. Nêzi hezar kesi di şevê de besdar bûn.

## Kongra 11'emin ya Federasyonê

Di navbera 8 û 10'ê Sibatê de Kongra 11'emin a Federasyona Komelên Kurdistanê li Swêdê li Stockholmê civiya. Ji 205 nûneran 170 nûner di Kongreyê de besdar bûn.

Di sê rojê Kongrê de nûneren Federasyonê bi firehi li ser kar û barê komelên xwe sekinin û li ser pirs û pirsegirêkên civata Kurd a Swêdê munaqese kirin.

Ji bo Komita Karger ya Federasyonê ev kes hatin hilbijartin:

Wildan Tanrikulu, Mahmûd Kiper, N. Kiriv, Ehmed Qaramûs, Mihamed Haci, Berzan Şexsiwar û Cuma Aslan. Komite Giştî di civina xwe ya pêsi de Wildan Tanrikulu serokê federasyonê hilbijart.

## Panel li ser rewşa şerê Xelîcê û pirsa Kurdi

Di 24'ê Sibatê de ji ali TEVGER, Cepha Kurdistana Iraqê, Partiya Demokrat a Kurdistana iranê û 11 partiyên Kurd li Stockholmê panelek li ser rewşa şerê Xelîcê û pirsa Kurdi çebû. Li ser navê Cepha Kurdistana Iraqê Mecid Cafer, li Ser navê TEVGER'ê Kemal Burkay û li ser navê KDP-İ Selim Baban di panelê de axaftin. Kemal Burkay di axaftina xwe de got: "Ev şer şerekî neheq e. Saddam in-sanekî erîşkar û dagirkar e, Bush ji berpirsiyarê emperyalîzmê ye û ji bo neftê li wê derê ye.

Kurd divê neyên listika emperyalîzmê lê ku ji destê

me were emê jî pihînekê li Saddam xin".

Di dawiya axaftina xwe de wî carek din jî da diyarkirin ku "Kurd tenê bi qeweta xwe karin mafêñ xwe bi dest xin û ji bo vê yekê divê ku em tev imkanen xwe seferber bikin û dengen xwe bigînîn xelkê xwe û rîxistinê navnetewî".

Herweha kesen ku di panelê de wek guhdar besdar bûbûn bi kurtayî be jî imkan ditin fîkrîn xwe li ser pirsgirêkê diyar bikin.

Di panelê de nêzî 200 kesî hazir bûn.

## Fîşa abonetiya Armancê

- Salek  
 Şeş Meh

Abonetiya salekê	
Li Skandinavya	150 SEK
Maqam / Myndigheter	250 SEK
Li Ewrûpa	50 DM
Li derveyî Ewrûpa	35 \$

Tarîx: .....  
Nav û paşnav: .....  
Navnîşan: .....

Welat: .....

Postgiro: 50 37 99-9 Sweden

Heqê abonetiya xwe li ser postgiroya jorê bişînin. Fotokopya kvîtoya heqê abonetiyê û fîşa jorîn dagirin li ser adresâ jérîn ji me re bişînin.

Adres: P. Box 6004, 172 06 Sundbyberg/Sweden

## Ferfienga Lîteratûri

## Amadekar Bavê Nazê

## Trajediya

Trajediya ji gotina Yûnanî tragos (nêri) û odê (stran), hatiye. Trajediya navê xwe ji ber urf û adeta Yûnaniyan girtiye. Wan li ser şerefa Xwedayê meyxwesê - Diyonîs- nêri serjedikirin. Pêla ku zehiyê qurbanî Xwedê dikirin, Yûnaniyan di ber re dîlan dirgirtin û stranên xwe digotin. Dûre li ser bingehê vê teqlîda gelêrî, forma lîstikê li ser sahnê stend. Û di sedsala 5'an de berî serdemâ me, di berhemêm Isxîl, Sefokel û Yefrid de, trajediya digihê derenceyek bilind. Û bixwe di serdemê vejandin û tenwirîyê de trajediya di berhemêm Şekspîr (li Ingiltere) Kornel û Rasîn (li Fransa) û Şîler (li Almanyâ) gavênuh davêje.

Trajediya wek rengekî ji rengekî dramê li ser bingehê konflîkt weha tê avakirin ku kesen dubendiyê bi hev re dîkin, li hev nakin û bi kuştina leheng temam dibe. Pirê caran hêzên ku li hemberî leheng radiwestin, jê bi hêzîr in û xurttir in.

Trajediya, bi xususiyeta konflîktta xwe û qerekteren xwe, ji rengekî edebî yên din tê temyîz kirin.

Dijitî di trajediya de wilo dijwar e, heya dihêle di lihevhatina di navbera hêzên ku qayışî bi hevre dîksînin de ne mimkun e. Bi awakî giştî pirsên ku xurûcir, di trajediye de li ser wan çedîbin pirsên dîrokî û cîhanî ne. Bi xwe ji ber ku ji lehengen piyesen trajedî tê xwestin ku pirsên aloz çareser bikin, dihêle ku ev rengê ha ji yên dramê tabieki felsefî nefsanî bistîne. Ew dibe felsefî ji ber ku bi tema xwe daîmî ye (1) û ew dibe nefsanî ji ber ku neçareserkirina problem dihêle leheng bi xwe re têkeve xirûcirek psîkolojîk. Bi xwe berhemên trajediye yê heri bi nav û deng li cîhanî ji me re nasin. Ma kê navê "Promîtê yê Qeytluri" yê Isxîl, "Hemletê" Şekspîr, "Fustê" Gote, "Boris Godanovê" Pûşkin û "Jiyana Galilo" Brecht ne bihîstiye. Li gel ku sedsal di ser van berheman re derbas bûne, her ew dijîn

û ujdanê temaşevanan dihejînin. Ne bi derewa rexnegirê Rûsî yê mezin Blinski di derheqê piyesa trajedî de gotiye: "Trajediya derence herî bilind ji dramê ye û taca wê ye..."

## Drama

Drama bi mefhûmê xwe yê teng, rengek ji rengek cinsen edebî ye. Drama bi vê manê piyesake ku li ser bingehê konflikt (dijitîyek) ciddî û aloz tê ava kirin. Dibe ku elementen trajedî û komedi jî tê de peyda bibin. Bûyer hêdî-hêdî pêşde dicin.

Di destpêka çêbûna xwe de, drama ji çend elementen hunerî yê aloz pêk dihat; kor, diálog, dîlan û işareten bi destan (pantomîma). Ev yek heyâ quanaxek dirêj, li Rojhilat (Hind û Çin) hate parastin.

Herçî drama Ewrûpî li Yûnanî qunaxa hukmê kolan ew çê bû û di heyamê Isxîl, Sifokel û Yerfid de gihaş sewiye bilind. Di wê wextê de di bûyerên dramê de cîye kî mezin didan hêzên nedî (mîf û ligend) ku ew bi her tişte xwe di ser insan re bû.

Lehengen drama antik, bi qerekteren xwe vekirbûn. Bi gotinek din ew di çerçewa sixemek hazirkirî digerîyan. Ji ber vê yekê, leheng ji destpêka derketina xwe li ser sahnê, naskirî bû. Loma jî ne bi riya dijîtiyê (konflîkt) qerekterê lehengan ji hev dihatin derxistin. Çimkî rewîşten wan belû bûn û seranser dihatin naskirin.

Di serdemâ Navîn de, pêşketina drama bi tealmîn filetiyê girêdayî bû. Dêrê destê xwe danî ser destgehê çandî û nedîhiş ew ji çerçewa terbiyetiye olîti derkeve. Bi vê yekê edeba dramî ji kete bin qeyd û merbendê dêrê. Lê tevî van astengan, drama di heyamê Vejandinê de, hema bi awakî giştî di çerçewa dêrê de digere û hêdî-hêdî xwe ji axlaqiyeta olîtiyê rizgar dike. Bi vî tişti, ew bi xurtî pêşve dike. Û bi taybetî li Ingiltere, ew dijîhê sewiye herî bilind. Berî her kesî, bi saya Wilyem Şekspîr (1564-1616) drama gavênuh xwe

yên nuh davêje.

Roja iro, literetûrnas drama vê qonaxê, bi ya realizma vejandinê didin naskirin. Û sedsala 17'an destpêka drama klasikî ye. Bi xwe hukmê absûlütîzmê, li Fransayê bi ideolojiya xwe, dibe bingehê naveroka rebaza klasikî yê. Û ew li ser sê hîman (bûyer, dem û cî) tê avakirin. Di fikra xwe de ji, bercewendîya ferd bi giştî ji bo ya dewletê, diviyabû bihata sixurandin. Lê di kîlîka Tenwîriyê de (sedsalan 18'an), êdî motîvî ku bi koranî xizmet ji destelatê re nebe, dest pêkir û bi vê yekê, elementen rîbazeke nuh -romantîzm - peyda bûn. Û di sedsala 19'an de mezhebî romantîzmê li Fransayê dibe yê herî bilind. Ev tevgera lîteratûri bi navê V. Hugo tê girêdan, ji ber ku wî bi xwe bingehê teorîtik jê re daniye. Hugo bi xurtî rexne li mezhebî klasikî dike. Ew dibêje ku "her sê wehdat" di dramê de, ji bo pêşdebirina wê dîbin asteng û kelem.

Li gora nêrîna nivîskarê mezhebî romantîzmê, "eqlaniya" klasîzmê rî li ber xeyala nivîskar dike. Bi ya wan divê merovî edib xwe bispêre xiyalek romantîk da monologa nivîskar tevî diyaloga lehengan bibe. Bi xwe, bi taybetî vî tişti dihiş ku subjektivizm di drama romantîk de, bi ser objektivizmê keve...

Di sedsala 20'an de, pêşengî di edeb de, dibe ya realizma rexnegirî. Û drama ji, ji xeyala romantîkî, ji esimana dadikeve erdê. Êdî pirsên civakî û problemen kesen adî, dîbin mada bingehîn ji dramê re. Helbet nayê wê manê ku (bi serketina realizmê) rî li ber cihok û rîberen edebî yê din hatin girtin. Na. Hîn ceng di nav mezhebî edebî de di dramê de berdewam e û dawî, wê bibe ya dema bi pêş de, tê.

(1) Têmîn daîmî di edeb de ew têmîn ku bi mefûmîn xwe felsefî ne û tu carî nayê miçiqandin û her û her berdewam in. Wek nimûne têmîn mirin û jiyanê, kîn û hezkirîne.

ne karê aqila ye  
lê rast e

## Amadekar: Hesen Mizgîn

1300 milyon çelekên li dinê di salekê de 100 milyon ton gaza metanê berdi din.

Makîneyeke nuh ya firaqşûştinê firaqen qirêj bi dengê ultra paqij dike. Firaqşûştin 8 deqiqe digre.

Bi kadastrofa lehiya 1988'ê li Bangaldeşê 20 milyon insan bêmal man. Eger

hesabê ku tê kirin li gor texminan derkeve û %20'ê Bangaldeşê di bin avê de bimîne.

Cixarekêşandin nexweşîna HIVê zütir diguherîne AIDSê. Li gor lêkolinê ku li ser 387 kesan hatiye kirin îhtimala ketina bi nexweşîna AIDSê ji bo cixarekêşan du qat zêdetir e.

Doktorê diranan wê ji matqabêni xwe yên adeti xilas bibin. Li DYD matqabek bi laser hatiye çekirin. Matqaba bi la-serê mirov naêşine, him kokên xirabûyi tedawî dike him jî ciyê qul tije dike.

Eger mirov hucreyên sor (alyuvarlar) ên xwînê li pey hev rîz bike dikare du caran li dora dinê doş bibe.